Çand hafizeya zindî ye

Em dibînin di her serdemekê de jinê bi awayekî ev nirxên çandî li dora xwe kom kirine; haya wa ji vê yekê hebûye ku ev hafize wê veguheste çaxeke din û bi vê berpirsyariyê nêz bûye. Jinên Rojhilat li rexmê nêzikatiyên paşverû dest ji têkoşîna xwe bernedane... *Zehra Mohammedzadeh / R.2*

"delîlo delîlo dest(d)anê.."

Giranî, sivikayî, milanî xwe dabûn kêleka koçerî bi destmala şînê tarî. Ne me dev ji giraniya xwe berdida û ne me milê xwe dikir dîlanî. Dilê me dianî hesret û li ber deriyê me datanî. Me deriyê xwe dadida li dildaran û me qefle qefle kelmêşên reş dikirin mêvanî... *Yildiz Çakar/ R.3*

Eliyo Bira yê li Newala Qeremûsê

Nizanim çend sal çêbûn; her payîz e, ber destê sibehekê, baraneke nermik xwe li deşteke bêdar digire, bêhna axa sor difûre, şalûlek xwe tîne bîra kendalekî. Dîsa firar û qeçax li devereke asê, asê mane. Hawar û îmdadek nîne. "Kurmancên deştê" giliyê wan kirine... *Selîm Temo / R.5*

Rojnameya Heftane

xwebûn

20-26 Çile 2020
Hejmar: 5
Buha: 4 TL

www.xwebun.org
rojname@xwebun.org

Zarok êdî bi kurdî mezin nabin

ZIMANNAS ZANA FARQÎNÎ têkildarî Tora Ziman û Çanda Kurdî û her wiha girîngiya ziman ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Ez wek kesek li ser zimên dixebitim, di van xebatan de dertê holê ku em ziman û çanda xwe venaguhezînin nifşên nû. Em nikarin emanetê me ji dê û bavê wergirtiye bidin zarokên xwe. Zarokên me bi zimanê xwe mezin nabin û ranabin."...

Hevpeyvîna Bîlal Guldem / RÛPEL - 4

Tora Ziman û Çanda Kurdî... Samî Tan /R.11

Teşebiseke pêwîst û wêrek... Zekî Gorur /R.11

Otopsiya sersalekê!

Sala borî, li ser maseya otopsiyê bûbû raportek bi xwîna kurdan neqişandî, kurdîtî çi xwînbehr e, bi sedsalan e xwînrij e lê dawî lê nayê! Min bi çavên girtî dît; baranê raporta otopsiya sala nû bi lez xist berîka xwe. Bi çavên tije serborî li me mêze kir û çû ber bi serboriyek nû ve. Niha bê pirtûk û helbest im lê di bîra min de ev riste maye, bila diyarî be ji bo we; "Hozan in, bi dilê xwe tûj dikin şûrê xwe."...

Mizgîn Ronak / RÛPEL - 3

Namdarê Kurdan

Zanayîş, huner, tarîx, kultur, edebîyat, deyr, deyrbazî, folklor û heta şer zî tede xeylê çîyî kitaban ra yenî musnayîş. Kitabî tarîxê nuştekî yê nê çîyan î. Wêşanxaneyê J&Jyî ra ziwanê kirmanckî de yewna eserêko newe vejîya. Nuştoxê kitabî Suleyman Yilmazî seba ke namdarê kurdî nêrî vîrîkerdene û neslê neweyî zî înan bişinasnî kitabêko bi nameyê 'Namdarê Kurdan' vet...

RÛPEL - 9

Li hemû parçeyan rojev yekitîye

Ji bo partiyên siyasî yên kurdistanî tişta herî girîng yekitî ye û ji bo wê jî banga paşvehiştina pirsgirêkên navxweyî û nakokiyan tê kirin. Li gorî nûnerên siyasî heke dîwarên li pêş xwe rakin dê bêhtir nêzî hev bibin. Bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê nîqaşên yekitiyê berfireh dibin. Dawiya hefteyê 9 partî û rêxistinên kurd bi rojeva yekitiya neteweyî li hev civiyan û gaveke mezin avêt. Serokê KKP'ê Sînan Çîftyurek destnîşan kir ku divê partiyên siyasî êdî nakokî û pirsgirêkên navxweyî li aliyekî bihêlin û bên cem hev. Serokê Giştî yê Partiya Azadî Ayettullah Aşîtî jî di nirxandina xwe de bal kişand ser mijara di olê de netewebûn û wiha qal kir: "Ola Îslamê ne li dijî netewebûnê ye. Netewebûn hewce ye." 26 partiyên kurd yên li Sûriyeyê ji bo yekitiya neteweyî gavek nû avêt û bang kirin ku bê şert û merc bên gel hev. Partiyên siyasî yên kurd bi daxuyaniyeke nivîskî bang li yekkirina ref û helwestan kir... */R - 6/7*

Felemez Ulug
Lêgerîna desthilatdariyê
Rûpel - 7

Sedat Ulugana
Şerê Cîhanê yê Yekemîn û eşîrên kurd
Rûpel - 8

Şener Ozmen
Dojeha ku li can û cesedên xwe digere
Rûpel - 11

Agît Yazar
Qada şerê dêwan: Dara
Rûpel - 12

Ziringînî ji bin guhê we were!

Qirix hat û meşiya
Qelem xist nav tiliya
Bang kir Îmam Cîciya
Tersteqle û çendek diya
Go min Zrîng ji we re aniya
Kovara xêzkariya
Xelo ji kêfa ziriya
Şevo rabû firiya
Malî rabûn ser piya
Hêlo li qerfê geriya
Ji kerban re giriya...

Dildarê Amedê /RÛPEL - 10

Hîç fedî nakin

Tabeleyên bi tirkî û kurdî yên li şaredariyan daxistin û li şûna wan tabeleyên bi tirkî daleqandin. Destpêkê li Bedlîsê ev kirin. Tabeleyên şaredariyan ên pirzimanî yek bi yek hatin daxistin... *RÛPEL -3*

No rayraberdiş paştî dano kerdoxan

Çîyo balkêşin ra yew zî oyo ke Dêrsim de hedîseyê îstîsmarî virazîyayî û virazîyenî. Dêrsim de 5 aşmanê peyênan de 4 hedîseyê îstîsmarî qewimîyayî. Ame zanayene ke qezaya Pêrtagî ya Dêrsimî de xeylê domanê lajî yê 11 û 16 serrî raştê îstismarê cinsî ameyî. Qerarê nimitişî dîya tehqîqatî ser. Verê cû Cizre de, Çewlîg de û Mêrdînî de serebûtê îstîsmarî amebî meydan... *RÛPEL - 9*

Otopsiya sersalekê

Tu bi serêşiyek dijwar şiyarî sala nû bûyî. Sala nû; êşên kevn, serêşek arkaîk... Te hew dît ku wa tu li 'bexçeyek tenha' li ber baranê yî. Te xwest her tişt şil bibe, bi taybetî jî serê te yê ku dûmana êşek kevn jê dikişiya

Mizgîn Ronak

Te îsal nexwest tevli şanoya pîrozkirina sersalê bibî, te got "Ez nexweş im." Tu bi rastî jî nexweş î, şaîriyek nexweş, (Gelo şairtî navê kîjan nexweşiyê, sernavê kîjan jana zirav e?) lê tu dîsa jî ji her kesê baştir bûyî. Tu zîq sekinî li dawiya salek û li serê salekê. Tevli şahiyan nebûyî. Şahiyên sexte, wekî peykerek sekinî li nêv şevê. Ne salname, ne katjimêr, nebûn xem ji te re, ne ji hîqehîqên piştî saet dozdehan. Rûyê geş ê li ber dilê te, yê Ranyayê bû; di wê paşnîvroya bi tenê de û her rûçûyînek bû. Her çûyîn, lîstikek ku tim ê/a çûyî bi ser diket.

Tu bi serêşiyek dijwar şiyarî sala nû bûyî. Sala nû; êşên kevn, serêşek arkaîk... Te hew dît ku wa tu li 'bexçeyek tenha' li ber baranê yî. Te xwest her tişt şil bibe, bi taybetî jî serê te yê ku dûmana êşek kevn jê dikişiya... Saetek, sê çar saet, tik û tenê meşiyayî. Baranê rûyê te şûşt, we bi hev re îskanek av vexwar. Wekî ku ew av xwîna baranê bû te vedixwar xwîna te bû, baranê vedixwar. Dilopên baranê herikîn ji ser rûyê te. Anîn bîra te; tu herî dawî di avrêlê (nîsanê) de çûbûyî ber baranê û di wê çilesra ne efsûnî de te pê derxistibû ku baran û rondikên te bi hev re ketibûn pêşbaziyek bêdeng lê dawiyê her du jî lingşikestî mabûn.

Erê, şanoya sersalê hatibû, her kes şanoger, her cil ê lîstikvan, her kes cidî bû. Lê baranê te li ser maseya otopsiyê wek kefiyeyek ji dara ziyaretê hatiye dizîn, raxistibû lêkolîn dikir. Dilê te qelaştibû, mîkroskopan digot ku "bi sê helbestên nîvîmayî ji paş ve hatiye kuştin." Destên te! Destên te yên ku goya ji bo azadiya Kurdistanê bê kurdî bi rişmê hespê boz ve şîn hatibûn, kuştî hatibûn dîtin, di wan de nivîsên kurdî yên ku êdî tu kes naxwîne hatibûn dîtin.

Baranê otopsiyê didomand û te bi çavên pisîkek fediyok a bi zaroktiya tevî kurdan hatî, li hûrgiliyan mêze dikirin. A wayê serê te! Xeyalên ku tê de wekî maran û heştpêyan dimilmilîn ji hêla rastiyên bi qefes vehatibûn rûçikandin (Ma qefes dikarin birûçikînin?). Ez nabêjim lê otopsiya baranê dibêje û ev der ne morga Meletiyê ye, nizanim li ku ye? "Nizanim li ku"çi ye îcar her hal navê derek pir taybet e ka hiş be, otopsî derman dike lê nemiribûn, bûbûn kevir û nehiştibûn ku xwîn here mejî. Dor hatibû ser sîngê te! Dema bi xencerên taybet qelaştin, beytika hozantiyê jê firiya û her tiştê wê mir! Dema ku her tiştê hêlîna dil, sîng mir, baranê destê xwe ji otopsiyê şûşt; bi fikrên bi perik dirût û fermûara sala nû kişand. Na ew fermûara can û cesedê te yê li bin baranê bû û tu hêna jî wekî temaşevanek filîmên komediya romantîk, bi dilopên barana bi tenê re dimeşiyayî. Ev nivîs dihat bîra te. Te digot "na, niha na! Niha nikarim binivîsim û heya ku xwe bigihînim heyama nivîsandinê jî dê kevin bibe. Niha bisekine." Lê dil, bîr û hişê te bûbûn pênûs, nedisekinîn, li bin baranê, ji bo baranê dinivîsandin. Li ser eniya te, li ber kaxizên dilê te yê otopsîkirî û bi nîvîmayîna sê helbestan, kuştîmayî dinivîsandin.

Rastî baran e

Sersal bû, wiha digotin. Her hal wateyek wê hebû yan jî 'serek' wê. Lew digotin "Sersal, serê salê." Tu bi meşa ku ji ber êşa serî serxweş bûyî dimeşiyayî. Porê te yê bê kum û kolos şil û pil dibû, serêşa sersalê jî sivik… Ji nişka ve ji te eyan bû, te got; "Ev sersal, sersala kuliyên xemgîn û kêzikên berbiteqîn e!" Navandin girîng bû ku te bigota sersal; a serkeftina pîroz a dîrokî û rojevî ye jî dê tu tişt neguheriya. Lew navandin çiqas bi şewq û şemal an bêsal û desmal be jî nikare rastiyê biguherîne. Lew rastî baran e û te şil dike, dişelîne, dipelîne, di raportek otopsiyê de dihetikîne yan jî digihîjîne asîmanê soromoro.

Te çavên xwe girt û çavgirtî meşiyayî, tiştek nehat serê te. Wekî ku dilopên baranê bûbûn rêber ji te re, li bin guhên dîwêr jî neketî. Çavên girtî, rûyê ku baranê şûştî, gavên bêtirs û bi sermestî. Qasek paşê te dît ku waye baranê sala borî li ser maseyê raxistiye û helbet otopsî! Di nav xwîna ku çûbû ser mejî de darzeytûnek daliqandî hat dîtin. Kesk bû, dijwar bû, Efrîn bû. Ji dilê wê, ax ji dilê wê! Girê Spî ku wek şaşikek spî ketibû bin simên hûtên heftserî derket. Şaşik êdî reş, gir êdî ne spî bû û Serêkaniyê, hemû kaniyan çikandibû. Ne av mabû, ne delav. Sala borî, li ser maseya otopsiyê bûbû raportek bi xwîna kurdan neqişandî, kurdîtî çi xwînbehr e, bi sedsalan e xwînrij e lê dawî lê nayê!

Min bi çavên girtî dît; baranê raporta otopsiya min û ya otopsiya sala nû bi lez xist berîka xwe, bi çavên tije serborî li me mêze kir û çû ber bi serboriyek nû ve.

Îsal bê çiya Newrozê nakim

Di şevek sersalê de risteyên te nexweşiya şairan li xwe pêçan û heta sibê bi wan risteyên Abdula Peşêw kete zikrê: "Îsal bê çiya Newrozê nakim." Te di gelek Newrozan de xwendibû lê dîsa jî tu ji derveyê şanoya pîrozbahiyê nemabûyî. (Qey pîrozbahî mecbûriyet in ne pîroz û bêkêf in?) Lê îsal ev riste bûn konê te û te xwe welê li wan veşart ku tenê baran dikaribû bigihîje te. Te îsal "Bê çiya Newroz û sersal nekir"! Kî naxwaze bila ew jî neke. Lew mecbûriyetên dagirkeran têra xwe giran û xedar in, hewce nake ku em jî li ser xwe û hev bibarînin. Lê bi serê ku baranê êşa wî şûştî û dilê ku ji bo we demên rûberfîn dixwaze, ji we re dibêjim; sersal û her tiştê we pîroz be, rûgeş û bi kêf be.

Min xwest helbesta xwe ya bi navê "Şûrê hozanan" li vir binivîsim lê min nedît û fêm kir ku meh û nîv berê ew pirtûk jî (Dilavî, helbest, Weşanên Ar) ji hêla gestapoyê ve hatiye talankirin. Niha bê pirtûk û helbest im lê di bîra min de ev riste maye, bila diyarî be ji bo we; "Hozan in, bi dilê xwe tûj dikin şûrê xwe." Gelo nexweşiya hozanan ne ji ber vê yekê be?

Zehra Mohammedzadeh

Çand hafizeya zindî ya gelan e

Rojhilatê Kurdistanê yek ji wan qadan e ku xwedî dewlemendiyek çandî ye. Erdnîgariyek berfireh e ku ji bawerî, ol, çand û zaravayên cihê yên kurdî re malovaniyê dike. Yên ku di dem û dîrokên cuda de hişt ev çand zindî bimîne û bûn perçeyek ji vê dewlemendiya çandî jinên rojhilatê Kurdistanê ne. Jin di dîrokên cuda de tev li raperînan bûne, têkoşiyane. Lê têkoşîna wan herî zêde jî di qada çandî de li pêş bûye. Bi stran, çîrok, helbest, destan û heyranokan, êş, keder û serpêhatiyên xwe anîne zimên. Mînaka wê jî helbestvan Xatûn Dayrakî Razdar e ku di sedsala 13-14'an de û Lîza Xanim e ku di sedsala 11'emîn de jiyane.

Li rojhilatê Kurdistanê parastina çand û ziman bi hêz bûye. Jinê bûyerên di serê kurdan de derbas bûne pir baş veguhastine nifşên nû. Dibe ku we hemûyan strana "Golnar" guhdar kiribe. Ev çîrokek a sadsala 18'emîn e ku behsa êrîşên Qaçaran a ser Xorasanê dike; li wê derê gel bi komî tê kuştin. Golnar lorîn, keder û êşên gelekî ye ku di feryada jina kurd de xwe digihîne roja me ya îro. Dîsa mirov dikare Heyran Xanima Dunbulî mînak nîşan bide ku di salên serê sedsala 19'an de li Xoy, Urmiyê jiyaye û dûvre ji ber koça bi darê zorê diçe Tebrîzê. Wê helbestên bi zimanê kurdî, azerî û farisî nivîsîne û behsa sê dîwanên wê yên mezin ku nêzî pênc hezar beyt in, tê kirin. Ew jî di helbestên xwe de behsa rewşa dema tê de, êş, keder û rewşa jinê dike.

Em dibînin ku di her serdemê de jinê bi awayekê ev nirxên çandî li dora xwe civandine, hay ji vê yekê bûye ku ev hafize ew ê veguheze çaxeke din û bi vê berpirsyariyê bûye. Jinên Rojhilat li rexmê nêzîkatiyên paşverû, pîvanên zilam, êrîşên dagirkerên welatê xwe, dîsa jî dest ji têkoşîna xwe bernedane, nexasim jî di qada çandê de. Ji bo vê girîng e ku em behsa Cîhan Ara Paweyî bikin ku di sala di nîveka sedsala 19'an de jiyaye, jinek helbestvan, zanyar û têgihiştî bûye, kedeke wê ya mezin a çandî çêbûye. Ew bi rêya helbestên xwe li dijî koçberî, êşan, şer dike. Di heman demê de pergala heyî ya zilam jî dixe bin lêpirsînê; bi qasî di qada çandî û wêjeyî de têdikoşe, di van mijaran de jî xwedî têkoşîn e: "Ne zilam dikare derd û xemên jinan, birîndariyên wan û hêviyên wan fêm bikin, ne jî pergala serdest a heyî dikare ji jinê re bibe hemderd û pirsgirêkên wê çareser bike."

Bêguman ev hemû tiştên ku bi ked û hişê hevpar ê mirovan pêk hatine, teşe girtiye; ev tişt berhem û hêmanên bingehîn ên çandê pêk anîne. Di nav jiyana civakî de jin bi vê ferasetê nêz bûye, li dora civakê çanda heyî ya dewlemend hîn bi hestyarî honandiye û derbasî roja me ya îro kiriye. Ev yek bi taybetî ji bo civaka me ya kurd ku di her serdemê de rastî qirkirina çandî dihat, girîng bû. Ji ber ku çand nasnameya herî bi hêz a xwepênasekirina civakan e.

Ji ber vê çendê jî lazim e em qala Mahbanû Ebasî, ango Banû Şîrwanî bikin ku ew jî di demeke cuda de, bi dengê xwe rê û rêçekê ji çanda xwe re diyar dike. Banû Şîrwanî ku di sala 1929'an, li Qûçana Xorasanê tê dinyayê, bi stran û xebatên xwe yên çandî bûye çavkaniya hest û raman ji jinên Rojhilat re. Mirov nikare bêje ev tenê stran in, ji ber ku jiyan, çîrokên evîndariyê, talan, qirkirin, carnan jî qala çol, deşt, çiya û ber, şahî, şîn, nexweşî û baweriyên xwe kirine ku ev yek bingeha çandek dewlemend a kurd pêk tîne ku çand jî li dora van nirxan ava dibe. Ew bi strana "Gulnazikê xwe, lorikê xwe, lê yarê" behsa keçên kurd dike ka çawa piştî şer û talanê li bazaran hatine firotin, dike. Di strana "Ez aşiq im eman yarê" jî behsa derbideriya jinekê dike. Di stranên wê yên "Gulperî û dest bi hena", "Leylî û Leylane" û "Vay çi rozigar e" mirov pir aşkera dikare rewşa jinê, gel û civakê bibîne. 'Herayî; herayî hawara çiyayî ye!' Ev jî nîşana bûyerên penaberiya kurdan e. Li vir jî em dibînin ka çawa bûyerên bi êş, keder, şînên kurdan ji bo neyên jibîrkirin, robarek ji çandê ber bi siberojê diherike. Ev bixwe têkoşînek mezin a çandî ye! Helbet bi dehan mînakên wiha hene, armanc tenê di şexsê van jinan de balkişandina ser rol û têkoşîna jinên Rojhilat e. Wekî ku me di hemû mînakan de jî dît, çand li dora nirxan pêk tê, çand "xwebûn" e, nasnameya civakî ye ku bi kevneşopiya berxwedana jinê heya roja me ya îro hatiye parastin. Ger ev têkiliya xurt a dîrokî bê qutkirin, dibe ku meriv nikaribe dîsa bi vê rola xwe rabe û bibe dengê têkoşîn, êş, koçberî û lorînên gelê xwe.

Stêrka Gelawêj

Yildiz Çakar

“delîlo delîlo dest(d)anê..”

Bêriya ku rê me bibe, dibir jêbirka me, ji çîroka evînê. Ma ne ew cih bihuşta me bû, li ser singê. Dema me serê xwe dida ser, ser bi ser mezin dibû keskesor li ber. Sêr bû, di nav kefa destan de. Destan ji me dikir, dikirin em zînê bê mem! Me gotin didewisandin, me radihişt hemû rêyên dojehê û em diçûn. Diçûn em, evîn dima di dewsa me de.

-kes ji kesan diçû, lê evîn ji dilan nediçû!

Me bêriya xwe dikir ji çavên sewdayan û me şerma xwe dikir leheng û me li ba xwe dida rûniştandin. Rûdinişt tenêtiya me û me çîroka xwe bi awazeke şewat digot di ber de... Miradê me di ber me de dima weke aveke tahl. Tahl e gotinên evîndaran. Dişikîne hezar şûşeyên dil û şevan. Şev bû! Li me digeriya. Digeriya destên me di çola destanên me de. Lehengên me bi hêştiran li dû kerbeşan diket. Diket yeko yeko stêrkên me ji eniya me, tovên me li axa xerîb diket. Diket gotinên kilaman;

“delîlê gozê lê nemayê, avê çem û kaniya sar e çi bikim malê dinyayê, delîlê doz lê nemaye, delîlê lê gozê lê nemayê, avê çem û kaniya sar e çi bikim malê dinyayê, delîlê gozê lê nemayê bê te sebra min nayê.”

Giranî, sivikayî, milanî xwe dabûn kêleka koçeriyê bi destmala şînêtarî. Ne me dev ji giraniya xwe berdida û ne me milê xwe dikir dîlanî. Dilê me dianî hesret û li ber deriyê me datanî. Me deriyê xwe dadida ji dildaran û me qefle qefle kelmêşên reş dikirin mêvanî... Me xwe li dû xwe dihiştin ji milkê mîranî. Mîrzoyên me dibûn xulam li bihuşta biyanî. Biyanî bûbûn destdanên me ji me. Fêkî nedigirtin darên dilên me. Yeka me nedibû heft. Bihara me nedibû aheng. Dawetên me bêkes diman, ereb û kihêl kulek… Donzdeh zirne û def bi nifirek li ber bayê windabûnê diketin bi siwarên zemanan...

Me di xewnên şevan ên zemanan de, dengê berbûyan dibîhistin ji çermê defan. Şikestina kûzên bi şekir, dibû baran li emrê zarokatiyan. Me xwe hol dikir, me xwe çeng dikir, me xwe bi toza şekir dikir. Şekir dibû ramûsan li hinarûkên yaran. Sê caran dewsa xwe dihişt li şaneşînên berbangan.

Hêdî hêdî em winda dibûn. Kulîlkên me ji fistanên me yên çiftexasê diketin û birînên me ji dilên me. Êdî qalik nedigirtin evînên me. Robarên çavên me zuha dibûn, me kenê derewçîn dikir parî û me li parsa xwe dikir sedeqe... Gotinên zarokatiyê dadiweşandin weke toza genimên zer û li xeybaneyan ba dikir.

Me detoyên xwe li çûçan, çûçiyên xwe li biva dixist ji şêraniya zaroyan û me navê dayê û bavo li ferhengan dixist. Me dilê xwe li şevan dixist. Şevên ji zilûmatan, ku ji bilî xwedayan şahidê me tune bû, mohra qederan reşê qetranî bû. Her berbang li ber roja me qurnisandî bû.

Beriya ku rê me bibe, dibir jêbirka me, me ji çîroka çîrokê. Ma ew ne destmala sor a bi neqişkirî bû di paxila me de. Li ser dara jiyanê li benda kurê Mîrşahî. Kê em temdan bîra avê? Em çawa bûn gula avê? Di ber guhên lawên kurmênc de, çawa bûn kilama binyadê. Erê yadê, delîlê dilê me doz lê nemaye, çavên reşê tarî lê heyirî maye. Her çiqa bibêje heyva me ronî ye, siyek ji destê xweda li ber royê ye.

Dê navê wan di kulan de bê ser ziman

Kurd dikarin bi xebatên xwe yên ziman, navê kesên tabeleyên kurdî daxistin û saziyên çanda kurdî girtin, dê tenê dema ku qala derd û kulên xwe bikin, bînin ser ziman

Qedrî Esen

Li Tirkiyeyê gelek partî hatine ser desthilatê. Piştî çend salan ku li ser deshilatê mane, ji ber polîtîkayên şaş ên ku meşandine, têk çûne û çûne ser sergoyên dîrokê. Îro navê partiyan li holê nemane û kes nayne ser zimanê xwe. Ji ber polîtîkayên xedar ên ku li ser wan meşandine, tenê kurd carinan navê wan tînin ziman û qala serboriya xwe ya sermiyanê van partiyan dikin.

Niha desthilatê AKP’ê jî ji ber polîtîkayên xwe yên ku li ser kurdan û çand û zimanê wan dimeşîne, ber bi heman aqûbetê ve diçe. Ji bilî êrîşên siyasî yên ku li ser siyasetmedarên kurd kirine meriyetê, êrîşên çandî jî li ser kurdî dimeşîne. Weke mînak li şaredariyên ku di hilbijartinan de bi dek û dolaban girtin û şaredariyên ku piştî hilbijartinan bi rêbazên cuda desteser kirin, her tiştê têkildarî ziman û çanda kurdî ji holê radike û tune dihesibîne.

Bêyî ku fedî bikin…

Tabeleyên bi tirkî û kurdî yên li şaredariyan daxist û li şûna wan tabeleyên bi tirkî daleqand. Destpêkê li Bedlîsê ev kir. Hem tabeleya şaredariyê ya pirzimanî û hem jî gelek tabeleyên din ên nav bajêr daxistin û li şûna wan tabeleyên bi tirkî bi cih kirin. Piştre li şaredariyên ku desteser kirin jî serî li heman rêbazî da.

Elbet pişaftin tenê bi daxistina tabeleyan pek nayê. Ji bo vê yekê hemû saziyên çandî yên ku li wan çanda kurdî dihat pêşxistin girtin û xebatên çandî yên bi kurdî qedexe kirin. Niha li şûna van xebatên kurdî, xebatên tirkî ku qet eleqeya xwe bi çanda kurdan re tunene tên kirin. Bêyî ku fedî bikin, her roj afîşan li deverên cuda yên bajarên kurdan dadileqînin û ji bo pişaftinê bang li zarokên kurdan dikin. Mixabin hin derdorên ku bersiv didin vê bangê jî hene.

Îstifa kir û kurdî daxist

Şaredariya ku herî dawî serî li vê pêkanînê da Şaredariya Bajaroka Kaniyahenê ya navçeya Hezo ya Êlihê bû. Hevşaredarê Şaredariya Kaniyahenê Firat Karabûlût ku di hilbijartinên herêmî yên 2019’an de ji HDP’ê hatibû hilbijartin, di encama gef û zextên ku lê hatin kirin de, ji HDP’ê îstifa kir. Ev şaredar niha serbixwe ye lê îhtîmaleke mezin di rojên pêş de di komcivîvineke meclisê de dê derbasî AKP’ê bibe. Jixwe rayedarên AKP’ê jî di rojên dawîn de îşaretên bi rengî didin.

Bawerî winda kir

Şaredar Karabûlût, ji bo ku xwe bike çavê AKP’ê û derbasbûna xwe ya vê partiyê leztir bike, destpêkê tabeleya şaredariyê ya bi zimanê xwe (kurdî) daxist. Lê meclisa şaredariyê li dijî vê yekê derket û biryar da ku careke din tabeleya bi kurdî û tirkî li avahiya şaredariyê bê daliqandin. Hevşaredara Kaniyahenê Gulistan Sonuk jî got ku Karabûlût ji bo bi kêrî hin derdoran bê tabelaya kurdî ya şaredariyê daxistiye û ji ber vê yekê baweriya xwe ya di nav gelê Kaniyahenê de winda kiriye.

Komxebeta ziman û çandê

Li dijî van pêkanînan, dest û lepên kurdan jî negirêdayî ne elbet. Ji bo ku ev pêkanîn bên pûçkirin, di 11-12’ê çileyê de li Amedê ji aliyê Tora Ziman û Çanda Kurdî komxebateke girîng hat lidarxistin. Komxebat, bi beşdariya 300 delegeyan pêk hat. Cara yekemîn e li bakurê Kurdistanê têkildarî ziman û çandê civîneke wiha girseyî tê lidarxistin.

Ji bo bergiriya li hemberî polîtîkayên ku me li jorê qal kir, divê çalakî û xebatên bi vî rengî hîn zêdetir bên lidarxistin. Heke xebatên bi vî rengî bên kirin û biryarên mayînde bên wergirtin, dê di demeke nêz de polîtîkayên pişaftinê têk biçin. Her wiha kesên ku serî li van polîtîkayan didin jî weke yên beriya xwe biçin ser sergoyên dîrokê û tenê dema ku kurd qala derd û kulên xwe bikin, navê wan bê ser ziman û nifir li wan bên kirin!

ÎSMEK dersa kurdî dide

Dixwazim qala geşedaneke din a li ser zimanê kurdî bikim û bêyî ku gelek dirêj bibe nivîsa xwe bi dawî bikim. Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê, di bin sîwana Qursên Perwerdeya Pîşeyî û Hunerî (ÎSMEK) de cih da zimanê kurdî û jê re kontenjan vekir. Destpêkê wê ders li dibistanên ÎSMEK’ê yên Esenyûrt, Kiraç, Şîşlî, Bagcilar û Fatîhê bê dayîn.

Her çiqas ev qebûlkirinek be jî lê ne bes e. Ji bo ku kurd qayil bibin, divê teqez zimanê kurdî bi awayekî fermî bê nasîn û ne tenê ji bo hînkirinê lê pê perwerde bê dayîn.

Şîreta serweriyê ji bo we jî derbasdar e

Navenda Nûçeyan

Tirkiye, destpêka salê ji ber êrîşa hewayî ya Amerîkayê ya ku li dijî Fermandarê Îranê Qasim Silêmanî pêk anîbû û ew kuştibû; şîret li Amerîka û Îranê kiribû û aqil dabû wan ku şerê li dijberî hev nekişînin nav xaka Iraqê. Her wiha destnîşan kiribû ku bi êrîşên bi vî rengî serweriya Iraqê tê binpêkirin û ev yek ji aliyê wan ve nayê qebûlkirin.

Tirkiye piştî şerê naxweyî yê Sûriyeyê, niha bi şerê navxweyî yê Lîbyayê re mijûl dibe. Hefteya borî vê şîreta xwe ji bîr kir û êrîşê xaka pîroz a Şengalê ya Iraqê kir. Di êrîşa xwe de Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) kir hedef. Çawa ku erîşa Amerîkayê li Bexdayê li nav bajêr pêk hat, êrîşa Tirkiyeyê jî li nav gundê Dugir ê Şengalê pêk hat. Di encama vê êrîşê de 4 endamên YBŞ’ê ku bi awayekî fermî girêdayî artêşa Iraqê bûn, jiyana xwe ji dest da.



Parastina xaka xwe dikirin

Weke Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, hedefa vê êrîşê dîsa kurd bûn. Hem jî kurdên êzidî ku di dîroka xwe de tim bi komkujiyan re rû bi rû mane. Her çar endamên YBŞ’ê ku bi êrîşa hewayî ya Tirkiyeyê jiyana xwe ji dest dan, li dijî êrîşên DAIŞ’ê parastina xaka xwe dikirin. Ji aliyê vê hêzê ve heta niha tu êrîş li hemberî Tirkiyeyê pêk nehatine.

Li gel vê yekê jî Tirkiye bi hinceta PKK’ê di nav helwdanên têkbirina statuya vir de ye û ji ber vê yekê car caran êrîş dibe ser YBŞ’ê. Piştî êrîşê, ji aliyê artêşa Iraqê ve lêkolîn li cihê êrîşê hat kirin. Lê li gel ku lêkolîn hat kirin jî, ji aliyê Iraqê ve têkildarî êrîşê tu daxuyanî nehat dayîn û bertek ji Tirkiyeyê re nehat nîşandan.

Hincet vala ne

Ji bo her çar endamên YBŞ’ê merasîma oxirkirinê hat lidarxistin û bi hezaran kes tevlî merasîmê bûn. Ev yek jî dide nîşandan ku hincetên Tirkiyeyê yên êrîşê vala ne û YBŞ hêza parastina xaka Şengalê ye. Ji bo pêşîgirtina êrîşên bi vî rengî, weke ku Tirkiyeyê jî şîret li Amerîka û Îranê kiriye, divê rêz ji serweriya Iraqê re were girtin û tu dewlet şerê xwe li ser xaka dewleteke din neke.

ZIMAN ÇANDÊ HILDIBERÎNE, HILDIGIRE Û VEDIGUHÊZE NIFŞÊN NÛ

Divê em bibin xwe

→ **Bîlal Guldem**

Niha kesên ku li ser zimannasiyê dixebitin, gava pênaseya yekitiya neteweyan dikin yek ji wan hêmanan a sereke jî ziman e. Em vê jî baş dizanin, her çiqas ziman hêmanek girîng a çandê be jî ya ku çandê vediguhêze nifşan û mohra xwe lê dixe ziman e.

ZANA FARQÎNÎ kî ye?

Zana Farqînî di sala 1967'an de li Farqîna Amedê hatiye dinyayê. Farqînî wek xemxurekî zimanê kurdî di nav gelek xebatên zimên de cih girtiye û demekê serokatiya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê kiriye. Zana Farqînî bi ferhenga xwe ya tirkî-kurdî ya di bin banê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de hatiye çapkirin tê nasîn.

Me vê hefteyê ji bo xwendevanên Xwebûnê hevpeyvîn bi nivîskar û zimannasê kurd Zana Farqînî re kir. Kerem bikin em bi hev re, li bersivên Farqînî binihêrin.



Em dixwazin di destpêkê de armanca avakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî ji we hîn bibin, we çima pêdivî bi avakirina toreke wiha dît?

Dema me dest bi xebatên torê kir me got, derdek me û xemek me heye ku em hemû jê bi gazin in; ew jî ziman û çanda kurdî ye. Heke em bi awayek din bi nav bikin ew jî asîmîlasyon e, em dihelin. Sedema vê diyar e; polîtîkayên dewletên yekperest. Ji ber ku dewletê xwe li ser yekperestiyê ava kiriye, çand û zimanên din qedexe û înkar kirine. Her kes bi tena serê xwe nikare zêde tiştan bike. Belkî tenê behsa rewşê û tespîtan dike. Lê em êdî ketine qonaxeke wisa ku dem li me teng bûye û êdî em dema xwe nikarin bi tespîtan derbas bikin. Dema gavavêtinên pratîk e. Ji bo avêtina van gavan hewcehî bi sîwanekê hebû. Ji ber ku gelek sazî û dezgehên xebatên ziman û çandê dikin hene. Her kes bi serê xwe kar û baran dike. Belkî hin ji wan tên cem hev, lê me got hemû pêkhateyên çand û zimanê kurdî dikarin di bin navê tor an jî platformekê de bên cem hev û gavên pratîk bavêjin. Ji ber vê yekê ewilî bangawazî hat kirin, paşê civîna avakirina Tora Ziman û Çandan hat lidarxistin û daxwaza berfirehkirina torê hat rojevê û ev jî hat pejirandin. Sekreteryayek hat hilbijartin û xebata vê Komxebata Yekemîn a Tora Ziman û Çanda Kurdî kir û komxebat du rojan pêk hat.

Xal an jî ruhê ku van sazî û dezgehên sivîl anîn ba hev çi bûn?

Rêxistinên çandê, zimanî, hunerî, ragihandin, odeyên pîşeyî, rêxistinên zarok û jinan hene. Ji ber ku mijara ziman û çandê mijarek giştî ye û hemû endamên civakê eleqedar dike. Ev derd û kul tenê ne yê partiyek û rêxistinekê ye. Nexwe hewcedarî bi pêngavek sivîl a di ser siyasetê re ku bandora xwe li siyasetê jî bike hebû da ku siyaset jî van tiştan bike rojeva xwe û gav biavêje. Ji ber ku bîrdoziyên partiyan cuda ne, me xwest wek saziyên sivîl li hev kom bibin. Piraniya sazî û dezgehên sivîl beşdarî komxebatê bûn. Fikir û ramanên me çi dibin bila bibin, ya me hemûyan dike yek ziman û çanda me ye.

Çima navê tora we bû Tora Ziman û Çanda Kurdî?

Di civîna ewil a torê de li ser navê torê gelek nîqaş û gengeşe hatin kirin. Ji ber ku felsefe ev bû, hemû zimanên ku ketine ber pêla asîmîlasyonê yan jî hemû çand û zimanên ji ber polîtîkayên asîmîlasyonîst îro di xetereyê de ne, bi wê felsefeyê hat xwestin ku navek berfirehtir bê tercîhkirin. Ji ber ku em tenê li vê erdnîgariyê najîn. Her çiqas ên sereke em bin jî lê yên di nav me de jî dijîn û ji çand û zimanên cuda ne ji bo ew jî di nav de cih bigirin an jî çand û zimanên wan jî bên parastin felsefeyek wisa derket pêş. Tevî hemû nîqaş û pêşniyaran jî navê berê hat pejirandin. Lê piştî ragihandina torê ji bo berfirehkirina tora xwe ku em çûn derdorên cuda jî, yek ji mijarên gengeşiyê nav bû. Hat gotin ku em nikarin li ser navê ziman û çandên din biryaran bidin. Ew maf, ne mafê me ye. Eger ew nexwazin em nikarin li şûna wan daxwaza van tiştan bikin. Lê me ev felsefeya xwe parast. Wek prensîb em ne li dijî ziman û çandên din in. Em hemû ziman û çandên din di astekê de dibînin û hiyerarşiyê naxin navberê. Mafê her ziman û çandê heye ku bi awayekî azad li pêş bikeve û dikaribe çand û zimanê xwe veguhêzê nifşên nû. Ev prensîba me neguheriye. Her wiha di encamnameya komxebatê de jî hat aşkerakirin ku ziman û çandên din dîsa dikarin beşdarî torê bibin. Derî ji wan re vekiriye. Dikarin bi awayekî xweser di torê de xwe bi rêxistin bikin.

Ya girîng ev hat dîtin ku ji sedî sed beşdarên komxebatê kurd bûn. Giranî hat ser wê ku em pêşî ji xwe dest pê bikin. Ew kesên ku nikaribin derdên xwe çareser bikin, nikarên derdên kesên din çareser bike. Ji ber vê yekê divê em pêşî navê xwe deynin, em kî ne em çi kes in.

Dê statûya torê çi be û bernameya we çawa bi rê ve biçe?

Ji bo statûyê ango navê fermî hêj biryar nehatiye dayîn. Em ê dîsa xebatên xwe birêve bibin. Desteya rêveber ango meclîsa ji 27 kesan hat hilbijartin û dê xebatê bi rê ve bibe. Helbet wê bi piştevaniya pêkhateyan bê birêvebirin. Dê tor nexşerê û rêziknameya xwe diyar bike. Ev jî ew ê hinek bi demdirêjî be. Ew ê ev xebat tenê bi bajarekî nemîne. Dê xebatek bi giştî bê birêvebirin. Lê biryar hat dayîn ku navenda xebatê Amed be.

Di komxebatê de, ji siyasetê çi hat xwestin an jî siyaseta kurd di mijara zimên de hat rexnekirin?

A rast derd û xemên kurdan ne derd û xemên roj û salekê ne. Ji avakarina komara TC'ê heta îro ne. Pirs û pirsgirêk, gelş û gelemşe û daxwazî gelek in. Li gorî xwe, pirsgirêkên sazî û dezgehên kurdî hemûyan hene. Me di komcivînê de dît ku êşên ku bi van salên dûr û direj pêk hatine, daxwazên kom bûne hemû hatin li stûyê me bar bûn. Hemû pêkhateyan rexne, gazin, daxwaz û pêşniyarên xwe kirin. Pêkhate dibêjin ku siyaseta kurd ango HDP ya îro wek temsîla siyasî ye, bi me re bi tirkî dide û distîne. Yan jî zêdetir problemên me yên lezgîn û rojane naxe rojeva xwe. Dibêjin ew bêhtir bi yên gelemperî re mijûl e. Lê divê ez wiha bibêjim; mirov ji kê hez bike gazin jê dike û kî xurt be daxwaz jê tê kirin. Kî xwediyê wê hêzê be gazin û rexne li wî/ê tên kirin û hêvî jî ji wî/ê tê kirin. Ji siyasetmedar ango pêşengên civakî gazin tê kirin.

Bi kurt û kurmancî divê ziman û çand çawa bigihîje gel?

Ez wek kesek li ser zimên dixebitim, di van xebatan de dertê holê ku em ziman û çanda xwe venaguhezînin nifşên nû. Em nikarin emanetê me ji dê û bavê wergirtiye bidin zarokên xwe. Zarokên me bi zimanê xwe mezin nabin û ranabin. Problemên me yên bi vî rengî hene. Dema em civaka xwende û nexwende didin ber hev, ên ku nexwende ne bêhtir bi çand û zimanê xwe kurdî dijîn. Lê em ên xwende wek kurd najîn. Belkî di serê me de nasname û fikrên me yên neteweyî hene lê em bi çand û zimanê xwe najîn. Êdî zimanê me yê girseya xwende yê nav malê jî bûye bi tirkî. Ev xetereyên gelek mezin in.

Piştî ku medyaya zimanê serdest û dibistanên tirkî ketin her malek û gundekî kurdan bandorek pir negatîf li ser xelkê kir. Her wiha ew kesên ku bi zimanê tirkî perwerde bûn û bûn xwedî 'statû' karên bi 'prestîj', ji kurdî dûr ketin. Yanî tirkî bû zimanê rewacê, kurdî bû zimanê gundiyan û nexwendeyan.

Wek kesek rexneyek min li qenalên kurdan heye. Naveroka televîzyonên kurdan zêdetir nûçe û polîtîka ye. Televîzyonên xîtabî tevahiya civakê dikin kêm in. Di her cihî de siyaset û bîrdozî mirovan dikerixîne. Divê bi awayekî derûnî li vê meseleyê were nihêrîn. Civak dixwaze li rêzefîlman, kêf û henekan, li pêşbaziyên zanyarî û stranan guhdarî û wan temaşe bike.

Di nav kurdan de demek Bavê Teyar populer bû, bila bê pirsîn çima lê dihat temaşekirin û jê dihat hezkirin? Niha tu ji hin sînemager û şanogerên me bipirsî ew ê bêjin, ji aliyê hunerî ve asta wê gelek kêm e. Lê tu yên asta wan bilind çêdikî, çiqas li wan tê temaşekirin? Heke em bixwazin zimanê xwe zindî bihêlin divê em xwe bigihînin ferdên civaka xwe. Bêyî ez bîr û baweriya wan û siyaseta wan ji hev cuda bikim. Ji bo rê li ber asîmîlasyona dewletê were girtin em çi pêşkêşî civakê dikin? Yanî ev bername û rêzefîlm hene lê kêm in, têr nakin.

Tora we dê ji bo xebatên hevpar ên alfabe û edebiyatê çi bike?

Halê hazir kurd, alfabeya latînî û aramî/erebî bikar tînin. Ev rê li ber me digire ku em ji berhemên hev sûdê werbigirin. Dîwarek e di navbera me de. Beriya her tiştî divê kurd bibin xwedî alfabeyek hevpar. Meseleya zaravayan tiştek din e. Di vê mijarê de jî divê polîtîkayek me kurdan a hevpar hebe. Meseleya rastnivîsê du alî ye. Rastnivîsa alfabeya aramî/erebî cuda ye û ya latînî cuda ye. Di komxebatê de mijarên pirsgirêkên zimanî jî hatin nirxandin. Dê helbet tor li ser meseleyên zimanî û edebiyatek hevpar jî xebatan birêve bibe.

Mirov dikare bêje ku dê îsal bibe sala ziman û çanda kurdî?

21'ê Sibatê û 15 Gulanê rojên zimanî ne. 8'ê Adarê Roja Jinan û 21'ê Adarê jî cejnek neteweyî ya kurdan e. Di encamnameyê de behsa van rojan hat kirin ku ziman û çand derkeve pêş. Lê em ê li ser van rojan hin biryaran werbigirin. Wek ku di encamnameyê de jî hat diyarkirin pêwîst e îsal bibe sala seferberiya kurdî û Baba Tahirê Hemedanî û ji bo vê seferberiyê gavên şênber werin avêtin.

We derketina rojnameya me Xwebûnê çawa dît?

Dirûşma komxebata me "Em bi ziman û çanda xwe bijîn" bû jixwe Xwebûn jî ev dirûşm e. Divê em bibin xwe. Navek xweş û di cih de ye. Divê em li xwebûna xwe vegerin. Lazim e hemû xwendayên kurd xwedî li Xwebûnê derkevin û ji bo pêşxistina zimanê kurdî Xwebûn biçe her malê.

Li gor we ziman nasname ye?

Dema nasnameya te ji te bê pirsîn, tu yê berî her tiştî karta nasnameya xwe derxî nîşanî min bidî û ez nasnameya te bi zimanê te nas bikim. Divê ez gotina helbestvanê me Rojen Barnas bînim bîra xwe dibêje, "Zimanê min pasaporta min e, di devê min de."

Rêjeya jinan a di Tora Ziman û Çanda Kurdî de çima kêm e?

Rêjeya jinan a di torê de gelek kêm e. Mixabin ev jî ne tercîha me ye. Me dixwest rêjeyek wekhev hebe. Ev jî ji ber rewşa civaka me ye.

Beriya vê komxebatê sazî û dezgehên kurdan ên sivîl û yên siyasî gelek caran xebatên bi vî rengî kirin, lê heta niha encameke berbiçav xuya nabe. Gelê kurd ji vê xebata we bi hêvî ye?

Ji bo vê xebata torê ez wek kes naxwazim bibim sedema hêvîşikestinê. Ji ber ku em jî di vê torê de ne. Berê gelek car soz, bext û qerarên gelek giran ji bo gelê kurd ji aliyên dezge û rêxistinan ve hatin dayîn. Lê di dawiyê de di dest de tiştek nîne. Mirov hêvîşikestî dibin. Her çiqas niyet pak be jî lê êdî tesîr li civakê nake. Ji bo ku ev tişt pêk neyên divê em bi awayekî pir cidî li ser vê mijarê bisekinin. Û em sozê ku nikaribin bînin cih nedin kesî. Çi ji destê me tê em soza wan bidin. An na wê hêvîşikestinek çêbibe û em ê jî bişkên û baweriya gel ji me namîne. Divê mirov baweriya gelê xwe îstîsmar neke. Dema hêviya gel carek jî ji yekê an jî saziyekê bişkê, tamîra wê gelek zor e. Ev mesele jî wek biwêja me ya kurmancî ye "Gava ku şûşa dil bişkê êdî nacebire." Divê mirov tu car hêviya xwe qut neke. Yên me li ser piyan digirin hêvî û xeyalên me ne.



Mertal

Selîm Temo

Eliyo Bira yê li Newala Qeremûsê

Tu dibêjî qey du stranên cuda ne. Yekê Aslîka Qadir xweş dike, yekê jî Salihê Beynatî. Di herduyan de jî berxên "qewmê çiyê" ketine "erda nenas."

Nizanim çend sal çêbûn; her payîz e, ber destê sibehekê, baraneke nermik xwe li deşteke bêdar digre, bêhna axa sor difûre, şalûlek xwe tîne bîra kendalekî. Dîsa firar û qaçax li devereke asê, asê mane. Hawar û îmdadek nîne. "Kurmancên deştê" giliyê wan kirine. Leşkerên bêsûret û serhengên çavsor ligel milîsên rûreş weke ewrekî tîr dinizilin û xopana kozikê xera dikin.

Van stranan nehiştin ez têr rakevim, bimeşim, rûnêm, bijîm... Wek ku apê min ê Celîlê Celîl heft sal berê li Wana şewitî ji min re gotibû: "Selîmo, min şûna gora xwe kirîye. Ez dizanim wê min veşêrin ku derê. 77 salî me, lê ji van stranan têr nebûm!"

Ez jî têr nebûm. Wek pûnga li bajêr qermiçîm li kolanan. Milên min di stûyê jinên ji şimayê nermtir de man. Dengê min li jûrên li ber tavê raxistî peşkilî. Her kesirîm. Min xêrek ji jiyana xwe nedî. Pelgan ez veşartim. Ber bi çeman ve çûm. Starên şevan ez sotim. Bûm siya xeyalekê, bi ser palekî de qelibîm.

Bi van stranan li şevbuhêrkên çavşikên bi kesera mêrên derketî hesiyam. Tu dibêjî qey dengbêjan ez dibirim qada şer. Du çavên min hebûn; yekî li civatê dinihêrî ku ximam bû, yek diçû warê lehengan û bi wan re dimir.

Carinan ti amûrek li dora min namîne ku li stranekê godarî bikim. Lê olana dilî? Mala minê; ew şêrên çargurçik bêwar, bêwayîr û perkende mane. Mîtralyoz girêdane, taxim dişixulin, mawzerên serî karîban, birnoyên qundax-hilû, şeşxaneyên devzer her li dora serê "ferxê mala bavê min" digerin. Her leheng çîrokek û stranek xwe heye; lewra her dijî û her cara stran tê xwendin ji nû ve tê kuştin!

Di her stranê de peyvên ecêb hebûn, va îro jî tênahihêm ka çi dibêjin. Gava zarok bûm jî wisa bû; her tim bi kêmanî peyvek, gotinek hebû ku baş nedihate fahmkirin.

De îca Newala Qeremûsê. Di navbera pira Malabadê û Batmanê de, li aliyê Silîvan e. Ne şaş bim, roja bûyerê ne li wir bûm, lê ji roja min a pêşîn ve her li wir bûm. Newala Qeremûsê ji gundê me ve xuya bû. Di navbera me de çemê Batmanê hebû. Newal raserî gundê Pîleka, di navbera Sergewra û Dêrikê de bû.

Du stran hene. Herdu stran jî behsa bûyerê dikin. Du xortên Mala Eliyê Ûnis, qesta "xeta Frensawî" dikin, lê guhbelên li vê "erda nenas" wan didin dest.

Gava meriv bala xwe dide stranên bi vî rengî, wer dixuye ku "guhbel"ên dewletê bi taybet li dora Bismilê gelek in. Şêx Evdirrehîm û desteya xwe, Seyîdxanê Kerr û xortikên Mala Eliyê Ûnis li heman xetê dikevin kemîneya dagirkeran. Dikarim bêjim heman rêxistinê 39 şehîdên malbata min jî dane dest.

Li ser bûyera Newala Qeremûsê du kilam/stran hene, wek min gotî. Ez ê pêşî behsa ya yekem bikim, bila ya duyem bimîne nivîsa di dorê de.

Ka bêjim çi dibêjin ku nizanim! Di stran an guhertoya yekem de çend peyv û navên taybet hene. Wek mînak "Almeda Nîzamê", ne şaş bim qereqola Batmana kevn e. Beriya Batmana îro bê avakirin, li şûna bajêr nehîyeyek hebû bi navê Almedîna/Almeda/El-Medîna. Di 1927'an de çemê Batmanê rabû û bajêr daqurtand. Demeke dirêj li şûna Batmana îro avzêm û patrax bû. Li serê girekî ku dibêjinê "Serêgir" gundek ma bi navê Êlihê. Di Şerefnameya (1597) Şeref-Xanî de behsa "Begên Batman û Qulpê" heye. Navê Batmanê ji navê avakarê Merwaniyan, Badê/Bazê Dostkî zayîye. Bala xwe bidinê ku li gelek deverên Kurdistanê navên ji heman kaniyê hene: Badînan, Bezwan, Malabadê, Bazîd, Badikan, Pezûkî… Nizanim, gelo têkiliyek di navbera Almeda û Amêdiyê, Amed, Amûdê û hwd. de heye yan na?

Peyva "pêsîrtengî" olandar e. Êdî şervan ketine sîng û pêsîra hev. Dengbêj carinan dibêjin sîngedewran jî. Risteya "Li Çemê Heskîfê bigre heta Pira Batmanê li ser serê bavê Fexrî her car ferxê mala Elî da tîne qerewile, dicesise" jî bala min dikişîne. Xayînê hundirîn Hesenê Bitûs e. Vî Hesenî ji çemê Heskîfê heya Pira Batmanê cih li firaran teng kiriye. Qerewil, leşkerên nêçîrvan in, yanî beriya artêşê dikevin herêma dijmin; rê xweş dikin, agahî berhev dikin, astengên heyî radikin. Di artêşa Bayenderî (Aqqoyunlu) de bi navê "karavul" grupek hebû, ku îro tirk dibêjin "avcı asker/birlik." Wateyek xwe ya dî jî heye di kurdî de: Reşûpêş. Du dar weke xaç girêdidin, cilikê kevn lê dikin û diçikînin di nav zeviyê de.

Mirov têdigihê ku Hesenê Bitûs qerewilî dike, lê qey dicesise jî? "Dicesise" çi ye? Bila qerewil sîxûr be, casûs be, bi gotina Apê Osman Sebrî "guhbel" be, lê cesisîn/cesisandin? Koka "dicesise" casûs e (سوساج), lê "cesisîn" çi ye? Çawa dicesise? Çawa ji "nav" lêkereka bi vî rengî tê çêkirin? An guhbel qerewilî dikin, yanî dicesisin?

Ka stranê ji dengê Aslîka Qadir godarî bikin û li deşîfrasyona min binihêrin. Weke min gotî, di her stranê de peyvên ecêb hene ku îro jî tênahihêm ka çi dibêjin. Gava zarok bûm jî wisa bû; her tim bi kêmanî peyvek, gotinek hebû ku baş nedihate fahmkirin.

Guhertoya Aslîka Qadir distirê:

De heylê û heylê, heylê, Eliyo bira heylê
W'ez ê ç'a b'kim gelo Rom xayîn e, kesek hawara îmdada me de nayê
Eliyo bira şerekî l'me çêbû li Newala Qeremûsê, Kanîka Temo dilê mi ra bi bilind cî ya
Eskerê Almeda nîzamê, li ser serê bavê Fexrî her car ferxê mala Elî gelo dikişiya, l'hev diciv'ya
Wextê l'bavê Fexrî dibû delîltengiya mêra pêsîrtengî, bira ji derketa serê Silhedîn, lawê Temo, na wele mînanî gur e, gurê serê çiyê
Eliyo bira şerekî l'me çêbû li Newala Qeremûsê, Kanîka Temo dilê mi ra bi sûs e
Eskerê Almeda nîzamê, tivingê wan ser milê wan, dûr va têne diçirûse
De kulê têkevî mala pismamê nema, na wele Hesenê Bitûs e
Li Çemê Heskîfê bigre heta Pira Batmanê li ser serê bavê Fexrî her car ferxê mala Elî da tîne qerewile, dicesise
Eliyo bira şerekî l'me çêbû li Newala Qeremûsê, Kanîka Temo dilê mi ra bi binik e
Eskerê Almeda nîzamê, tivingê' wan ser milê' wan dûr va têne tiketik e
De kulê têkevî mala pismamê nema, çawa siyara meydanê ne hatiye kuştin Eliyê bira, şêrê min î çargurçik e!

Foto: 1936, Qamişlo ji hêla çepê ve: Yên li pêya: Eliyê Mihemedê Eliyê Ûnis, Mihemed Evdilmecîd Axa, Nesredîn Derwêş. Yên rûniştî: Derwêşê Eliyê Ûnis, Mihemed Eliyê Mihemedê Eliyê Ûnis. (Ji pirtûka Osman Sebrî; Şerên Sasûnê 1925-1937).

Ziman û Raman

Samî Tan

Tora Ziman û Çanda Kurdî

Hefteya çûyî (11-12ê kanûna paşîn) li Amedê komcivîneka bi beşdarîya 270 kesî pêk hat. Di vê komcivînê da li ser 12 maseyan, beşên cuda yên civakê rewşa ziman û çanda kurdî nirxand û di vî warî de hinek kêşe û arîşe destnîşan kirin, li hemberî wê jî hinek kar û barên pêwîst rêz kirin. Di komcivînê da 27 wekî desteya rêveber hatin neqandin, ew ê li ser van tesbît û pêşnîyaran bixebitin û nexşerêya torê derxin, li gorî wê nexşerêyê dest bi xebatên xwe bikin.

Di vê nivîsa xwe da min divê hinek tesbîtên di komcivînê da pêşkêşî we bikim. Ez ê niha qala pêşnîyarên çareserîyê nekim, bila ew jî bimîne bo nivîseke din.

1- Ji avakirina Komara Tirkiyeyê heta niha bi polîtîkayên yekperest dixwazin ziman û çanda kurdan tune bikin. Kurdan her çiqas heta demekê li hemberî polîtîkayên bişaftinê li ber xwe dabe jî asta ku îro em gihaştinê ne, nîşan dide ku zimanê kurdî ber bi tunebûnê ve diçe.

2- Rêjeya kurdî di malbat û siyasetê de kêm dibe.

3- Ji ber polîtîkayên asîmîlasyonê yên salan, zimanê kurdî di bin xetereyê de ye, nîşana herî mezin jî ev e ku transfera zimanî di nav nifşan de qut bûye û zarokên kurd bi piranî bi ziman û çanda kurdî najîn.

4- Yekemîn sedema jidestçûna zimanî pergala perwerdehîya yekzimanî ye. Ji ber ku çûna zarokan a pêşdibistan û dibistanan ji temenekî biçûk dest pê dike, zarok ji ziman û çanda kurdî dûr dikevin.

5- Problema herî mezin ew e ku çanda pirtûkxwendinê tune ye. Entelektuelîya kurdî gelek qels e. Siyasetmedar qet pirtûkên bi kurdî naxwînin, bi kurdî naaxivin, qîmetê nadin kurdî.

6- Hin malbat bi xwe li ser ziman û çandê nasekinin; zarokên xwe bi çand û zimanê kurdî perwerde nakin.

7- Yek ji pirsgirêkên mezin, pirgirêka hişmendîyê ye. Di nav gelî da hişmendîya zimanî pir qels e. Xelk bi vê meseleyê pir danakeve û li ser wê xwedî zanîn û agahîyan nîn e.

8- Di warê perwerdekirina zarokan da îmkan û materyal kêm in. Televîzyonek têra zarokan nake, gerek xêzefîlmên balkêş û baş hebin. Zimanê Zarok Tv gerek nêzî zimanê gelî be.

Ev çend xal me ji nav tesbîtan neqandin, encama ku ji van tesbîtan derdikeve ew e ku gelek kes bi xetereya li ser çand û zimanê xwe hesiyane. Di vî warî da jî helwesta herî xerab, helwesta wan malbatan e, ew ên ku bi zarokên xwe ra bi kurdî napeyivin. Ev yek dike ku ziman û çand ji nifşên berê derbasî nifşên nû nebe anku temenê zimanî bi vî awayî her ku diçe kurttir dibe û pê ra ziman û çanda kurdî her roj qels û lawaz dibe.

Civaka kurd heta roja îro bi rê û rêbazên klasîk karî ziman û çanda xwe bigihîne îro, lê bi taybetî piştî ku li gundan jiyan li mirovan teng bû, çi bi darê zorê, çi jî ji ber sedemên aborî gund vala bûn, gelek kes koçberî bajaran bûn, êdî derfeta parastin û geşkirina zimanê kurdî bi rê û rêbazên klasîk ji holê rabû. Îro êdî televîzyon ketiye her malê û li hemû gundan dibistan vebûne, ne tenê dibistan, pêşdibistan jî hema bêje bûne mecbûrî, vê yekê jî hiştiye ku ziman û çanda tirkî bikeve her malê û êdî di nav malê da jî cih li ziman û çanda kurdî teng bibe.

Belê xetere mezin e, rewş cidî ye, lewra divê helwesta me jî li gorî vê rewşê be û em di vî warî da xwedanê plansazî û bernameyeke taybet bin, xebateke zêde bikin.

Em hêvî dikin ku avabûna vê torê ji bo helwesteke zelal û xebatên xurt ên ji bo parastin û geşkirina ziman û çanda kurdî bibe destpêkeke nû.

Daxwazên gel paşguh dikin

Navenda Nûçeyan

Piştî êrîşên li hemberî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê, fermandarê giştî yê QSD`ê Mazlûm Ebdî banga yekitiya kurd kir. Li ser vê bagê Yekitiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê 6 panelên diyalogê li dar xistin. Şênî, partiyên siyasî, rewşenbîr, nivîskar û saziyên civaka sivîl ên girêdayî înîsiyatîfê di panelan de, nêrînên xwe anîn ziman û girîngiya yekitiya neteweyî hat nîqaşkirin.

Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyeyê (El-Partî) û Koordînatorê Giştî yê Yekitiya Hêzên Kurd Li Rojava Dr. Abdulkerîm Siko û hevserokê Yekitiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Ebûd Meqsû bal kişandin ser hewldanên ji bo yekitiyê.

'Înîsiyatîf gavek erênî ye'

Ebûd Meqsû diyar kir ku piraniya partiyên siyasî yên ji bo panelan hatin vexwendin beşdar bûn, lê tenê ENKS û partiyên di bin banê wê de dixebitin, beşdar nebûn. Ebûd, da zanîn ku partiyên siyasî bi beşdarbûna panelan isbat kirin ku înîsiyatîfa fermandarê giştî yê QSD`ê Mazlûm Ebdî pir girîng e.

Meqsû di axaftina xwe de bal kişand ser nêrînên kesên ku tevlî panelê bûn û got: "Bi rêya diyalogan sedema astengkirina yekitiya kurdan diyar bû, ev jî ji ber nêzikatiya partiyan e. Lewma banga me ji partiyên kurd re ew e ku li ser maseya diyalogan kom bibin û yekitiya xwe ava bikin. Ji bo gelê kurd ê li her 4 parçeyên Kurdistanê ev pêngava hebûn û nebûnê ye. Dema qala yekitiya neteweyî dibe, divê partiyên kurd berjwendiyên xwe deynin aliyekî."

'Yekitiyê bi derengî dixe'

Dr. Abdulkerîm Siko di axaftina xwe de bal kişand ser helwesta ENKS'ê û diyar kir ku ENKS hincetên bê bingeh derdixîne û armanca wê ya ji vê yekê derengxistina projeya misogerkirina yekitiya gelê kurd e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "ENKS'ê xwe spart hêzên derve û înîsiyatîfên çareseriya doza kurdî têk birin. Çawa diçin serdana kesên ku zarokên me qetil dikin û dibin sedema koçberiya gelan. Daxuyaniyên ENKS'ê yên der barê yekitiya kurd de xizmetê ji dijmin re dikin." Siko der barê sedema redkirina ENKS`ê ya yekitiya kurd de jî wiha got: "ENKS dixwazxe li derdora 30 partiyên din, pêkhateyên ereb û suryan paşguh bike. Divê ENKS beşdarî nav Rêveberiya Xweser a Demokratîk bibe û xwedî li mîrateya şehîdan derkeve."

Amerîka çavkaniyên dahatê hedef digire

Piştî ku aloziya di navbera Amerîka, Îran û Iraqê de rû da, bi awayekî berbiçav nirxê dînarê Iraqê li beramberî dolarê amerîkî kêm bû. Li ser bilindbûna dolar, pisporê aboriyê Dr. Xalid Heyder axivî. Heyder, da zanîn ku ger Trump Iraqê ceza bike, dê Iraq nikaribe pêdiviyên xwe ji derve dabîn bike û nikaribe neftê jî bifiroşe derve. Heyder anî ziman ku ji ber Iraq ne xwedî aboriyek wisa xurt e nikare pêdiviyên xwe, bi xwe peyda bike, pêwîstiya wê her tim bi welatên derve heye û wiha got: "Her cara ku pirsgirêkek welatên cîran çêdibe, dibe sedem ku rêjeya hawirdekirinê kêmtir bibe û kêmtir tişt bikevin nav bazarê. Li beramber vê jî asteke diyar a kiryaran li ser bazarê heye. Ev yek jî dibe sedema giranbûna nirxê kelûpelan li nav bazarê." ***SILÊMANÎ***

'Divê em yek bin'

Partiyên siyasî yên kurdistanî ji bo yekitiyê banga paşvehiştina pirsgirêkên navxweyî û nakokiyan kir. Li gor nûnerên siyasî, heke dîwarên li pêş xwe rakin dê bibin yek

Navenda Nûçeyan

Polîtîkayên taybet ên qirkirinê, li her çar parçeyên Kurdistanê tên birêvebirin. Kurd dema ji bo yekitî û statuyê nîqaşên berfireh dikin û tên cem hev bêhtir bi êrîşan re rûbirû dimînin.

Partiyên siyasî, rêxistin û saziyên sivîl ên kurd ligel nakokiyên navxweyî jî nîqaşên xwe didomînin û li ser girîngiya yekitiyê disekinin. Li rojava, başûr û bakurê Kurdistanê kurdan ji bo avakirina yekitiyê zend û bendên xwe badane.

Bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê nîqaşên yekitiyê berfireh dibin. 12 partiyên kurd di hilbijartina 24'ê hezîrana 2018'an de gaveke girîng avêtin û 'Tifaqa hilbijartinê' bi pêş xistin. Vê tifaqê di hilbijartina 31'ê adarê de jî berdewam kir.

Piştre jî ji hêla Tevgera Îslamî ya Kurdistanê (AZADÎ), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Komeleya Şoreşger û Demokratîk a Kurd (DDKD), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Partiya Însan û Azadiyê (PÎA), Partiya Kominîst a Kurdistanê (KKP), Platforma Demokrat a Kurdistanê (PDK), Partiya Demokrat a Kurdistanê - Tirkiye (PDK-T) û Partiya Azadî ve Xebata Tifaqa Kurdistanê hat avakirin. Bi vê tifaqê tê xwestin ku xebat bi rêk û pêk bên kirin. Tifaqê herî dawiyê li Amedê "Komxebata Yekitiya Neteweyî" ya ku 2 rojan berdewam kir li dar xist.

Serokê Giştî yê Partiya Komunist a Kurdistanê (KKP) Sînan Çîftyurek, Berdevkê Komeleya Kurd a Demokrat û Şoreşger (DDKD) Abdulhey Okumuş, Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Mesut Tek, Cîgirê Serokê Giştî yê HAK-PAR'ê Sedat Çinar û Serokê Giştî yê Partiya Azadî Ayettullah Aşîtî li ser yekitiya kurd nêrînên xwe anîn ziman û bal kişandin ser hewcedariya yekbûnê.

Pirsgirêk çi ye?

Sînan Çîftyurek li ser rewş û hewldanên partiyên siyasî yên Kurdistanê nêrîna xwe anî ziman û diyar kir ku mêtingeran hemû daxwazên neteweya demokratîk û hebûna kurdan tune hesibandin. Çîftyurek destnîşan kir ku divê partiyên siyasî êdî nakokî û pirsgirêkên navxweyî li aliyekî bihêlin, bên cem hev û wiha got: "Ger ku îro hûn li kolanê ji gel bipirsin û bêjin 'pirsgirêka gelê kurd çi ye?' ew ê bêjin 'divê partiyên kurd tifaqa xwe ava bikin', ev rastiyek e. Di navbera me de konseptên cuda hene. Ji ber vê yekê em bi baldarî nêzîk dibin. Divê berî her tiştî em dîwarên li pêş xwe rakin."

'Fikrên cuda xwezayî ye'

Nêzîkatiyên siyasî yên navxweyî jî bûn mijara nîqaşên rêxistinên siyasî. Mesut Tek ê mijar nirxand wiha got: "Ji ber ku pirsgirêka kurd ne tenê pirsgirêka civakekê ye û pirsgirêka neteweyî ye. Civaka kurd jî ji çînên cuda û fikrên cuda pêk tê. Di nav rêxistinên siyasî de ku ji bo yekitiya neteweyî têkoşîn tê dayîn de hebûna fikrên cuda tiştekî xwezayî ye. Ya ku mirov bê diêşe, tevî ew qas nîqaşan heta niha rêxistinên kurd nebûn yek. Demek dirêj e li Tirkiyeyê partiyên siyasî yên kurdistanî li ser rol û mîsyona xwe nîqaşên berfireh dikin. Di xebatên ji bo yektiya neteweyî ya kurd de ne guncav e ku HDP cih bigire. Bê guman HDP çawa xwe pênase bike li ser serê me. Ew xwe wekî partiya Tirkiyeyê pênase dikin. Ji ber vê yekê ji bo em bigihîjin armanca xwe HDP ne amûrek guncav e. Divê partiyên kurdistanî pêşengiya yekitiya neteweyî bikin. Niha DBP derdikeve pêş. Pirsgirêk ev e ku em ê pirsgirêka kurd çawa pênase bikin. Ger em pirsgirêka kurd wekî demokratîkbûna Tirkiyeyê bibînin, wê demê stratejiya vê yekê cuda ye. Rê û xebatên wê cuda ne. Em ne li dijî HDP'ê ne. Dibe ku HDP ji bo yekitiya kurd erkê bide ser milê xwe. Di yekitiya neteweya kurd de HDP rola "partnerekî baş" digire. HDP, dikare ji bo hêzên demokrasiyê yên li Tirkiyeyê bibe pirek baş."

'Netewebûn hewce ye'

Ayettullah Aşîtî jî di nêrînên xwe de bal kişand ser mijara di olê de neteweyîbûn û wiha qala mijarê kir: "Ola Îslamê ne li dijî netewebûnê ye. Netewebûn hewce ye. Di roja me ya îro de têgiha neteweyê cuda tê fêmkirin. Netewe cuda ye neteweperestî cuda ye. Neteweperestî ew tişt e ku îro tirk netewperestiyê dikin û dibêjin 'bextewar im ku tirk im.' Ev neteweperestî ye. Yanî ev tê wê wateyê ku tirk di ser her kesî re ne û ji her kesî baştir in. Di îslamiyetê de cihê vê nîne. Kurd ji bo avakirina yekitiyê her çiqas dereng mabin jî divê ji niha şûn ve hemû rêxistinên siyasî ji bo yekitiya neteweyî gavê biavêjin. Astengiya herî mezin a li pêşiya yekitiya neteweyî rewşa 'bêbawerî' ya di nav rêxistinên siyasî yên kurd de ye. Heke ev rewş were çareserkirin yekitiya neteweyî ew ê hêsantir pêk bê."

Armanca me hevpar e

Sedat Çinar jî xebatên tifaqa neteweya kurd bi "zor û zehmet"iyê pênase kir û wiha berdewam kir: "Ger ku di sedsala 21'î de hêj hûn nebibin xwedî statû û hêj hûn nebibin xwedî dewleteke serbixwe ev tê çi wateyê? Ev tê wateya ku we rêxistinek sivîl ava nekiriye. Nîşan dide ku we di aliyê siyasî, aborî, civakî û dîrokî de rêxistinbûnek ava nekiriye."Çinar bal kişand ser rewşa rojava û başûrê Kurdistanê û der barê rewşa siyasî ya van herdu parçeyan de ev nirxandin kir: "Niha li Rojava TEV-DEM û PYD bi hêz in. Ji ber vê jî berpirsiyariya mezin li ser milê wan e. Li başûrê Kurdistanê tişta di sala 2017'an de pêk hat ne hewldana "yekitiya neteweyî" bû. YNK û PDK xwe fikirîn. Dewleta kurd ji bo xwe nekirin armanc." Çinar, da zanîn ew naxwazin bibin pêveka HDP'ê û wiha axivî. "Ger ku em wekî partiyeke ku dikaribin têkevin hilbijartinê bin wê demê me yê tifaqa bi HDP'ê re cuda niqaş kiribûya. Em ne li dijî tifaqa HDP'ê ne. Em ne li dijî xebatên tifaqa neteweyî ya 10 partiyên kurd in."

Bo parastina nirxên neteweya kurd yekitî pêwîst e

Berdevkê Komeleya Kurd a Demokrat û Şoreşger (DDKD) Abdulhey Okumuş jî wekî nûnerên partiyên din li ser hewcedariya yekitiyê rawestiya û diyar kir ku îro kurdan di rojeva cîhanê de bi giştî cih girtiye. Ji ber vê yekê divê siyasetmedarên kurd jî li dora nirxên neteweya kurd kom bibin.

Okumuş, wiha dirêjî da axaftina xwe: "Gelê kurd ji bo mafê xwe yê kolektîf bi dest bixe, divê di serî de siyasetmedarên kurd bibin yek. Heta em li dora nirxên hevpar nebin yek em nikarin mafên xwe yên neteweyî biparêzin. Ger ku neteweya kurd yekitiya xwe ava bike, sala 2020'an dikare bibe 'sala kurdan'. Geşedanên ku li Rojhilata Navîn bi pêş dikevin, ji bo yekitiya neteweya kurd firsendek in. Îro Amerîka, Yekitiya Ewropayê (YE), Yekitiyen Ereban (YE), Rûsya û gelek welaten din li ser kurdan diaxivin. Dewlet û hêzên navneteweyî her dem li gor berjewendiyên xwe tevdigerin. Ji ber vê yekê divê kurd li ser têgihên neteweyî û navneteweyî baş rawestin û li gorî berjewendiyên neteweya kurd tevbigerin. Em dixwazin tifaqeke mayînde ava bikin. Wekî DDKD'ê xeta me ya sor nirxên hevpar ên gelê kurd in. Ji bo yekitiyê divê tu kes hincet nîşan nede. Em yekitiyê mecbûrî û ferz dibînin."

Herêm Tirkiyeyê naxwaze

Ligel nerazîbûnên gelek dewletan, Rûsya û Tirkiye dixwazin li Lîbyayê bi bandor bin. Hewldanên Tirkiyeyê îhtîmala çareseriyê kêmtir dike û ji ber vê jî hebûna wê nayê xwestin

Navenda Nûçeyan

Mijara vê hefteyê ku herî zedê di rojevê de ma agirbesta li Lîbyayê, ne îmzekirina peymanê û bidawîkirina agirbestê bû. Xelîfe Hafter ê li Lîbyayê û şefê hikûmeta Trablûsê Fayyez Saraj ji bo agirbestê berê xwe dabûn Moskovayê. Lê Hafter agirbest îmze nekir û ji Moskovayê veqetiya. Xelîfe Hafter piştî ku çû Lîbyayê diyar kir ku agirbest bi dawî kiriye. Ev mijar di rojeva hemû cîhanê de cihê xwe girt.

Gengeşeya li Lîbyayê ku derket hê jî didome. Di sala 2011'an de rejîma Qedafî ji aliyê NATO'yê ve hatibû hilweşandin û ji wê rojê şûnde aloziyeke mezin li welêt heye. Li rojhilatê welêt hêzên xelîfe Hafter û li rojavayê wê jî Hikûmeta Yekitiya Neteweyî heye ku Neteweyên Yekbûyî jî ew nas dike.

Hêzên xelîfe Hafter ji nîsana 2019'an vir ve, ji bo standina Trablûsê operasyonek daye destpêkirin. Hefteya borî bajarê Sîrte yê stratejîk kete bin kontrola hêzên Hafter. Şerê di navbera her du hêzan de, ev 9 meh in didome.

Hewldana Tirkiyeyê

Ligel ku tu dewlet li Lîbyayê leşkerên tirk naxwazin, Tirkiye helwesta xwe ya şandina leşkeran didomîne. Dewleta tirk bi hikûmeta Trablûsê re di meha mijdarê de peymanên leşkerî û behrê destnîşan kirin, piştre jî tezkereya şandina leşkeran a ji bo Libyayê li meclisê tevî îtiraz û nerazîbûnan hat qebûlkirin. Vê gavê aloziya li Lîbyayê zêdetir kir. Herî dawî Rûsya û dewleta tirk ji bo Lîbyayê banga agirbestê kirin.

Agirbest hat îlankirin

Hafter û Sarraj bersiveke erênî dan banga agirbestê û roja yekşemê piştî saet 01.00'an agirbest hat îlankirin. Lê piştre her du hêzan hev sûcdar kir ku li gorî agirbestê tevnegeriyane. Fermandarê Artêşa Lîbyayê yê girêdayî Hafter diyar kir ku wan wesayîteke hewayî ya dewleta tirk xistine. Her wiha dewleta tirk ambargoya çekan a Neteweyên Yekbûyî (YE) binpê kiriye û gelek çek, wesayîtên zirxî û hewayî ji Lîbyayê re şandine. Di hefteyên dawîn de bi balafiran gelek çeteyên li Sûriyeyê şandin Trablûsê. Tirkiye dixwaze bi çeteyan li herêmê aloziya heyî kûrtir bike.

Hafter peyman îmze nekir

Hafter û Sarraj ji bo agirbesta fermî bê ragihandin çûbûn Moskovayê. Lê encam nehat bidestxistin. Berdevka Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê Marîa Zaharova jî diyar kir ku Hafter bêyî ku peymanê îmze bike ji ser maseyê rabûye. Piştî ku Hafter vegeriya welatê xwe li wir bi mutefîqên xwe re banga bidawîkirina agirbestê kirin û gotin dê şer bidome. Piştî wê bangê hat diyarkirin ku ev li dijî mijarên ku Tirkiyeyê eleqedar dike derketine. Serokê parlamentoya Lîbyayê Eqîle Salih bang li dewletên Ereban kir ku roleke çalak bilîzin ku destwerdanên dewleta tirk ên li welatê wî sînordar bikin û got: "Peymana dewleta tirk a bi Sarrac re, bi hedefa piştgiriya milîsên çekdar û temamkirina talankirina dewlemendiyên Lîbyayê ye."

Tirkiye asteng e

Li gorî agahiyên televîzyona El Arabiya ya Dûbaiyê hat ragihandin sedema ku Hafter agirbest îmze nekiriye vekişîna leşkerên tirk a ji Lîbyayê ye û betalkirina peymana di navbera Trablûs û Enqereyê de ye ku di nav agirbestê de tune ne. Xelîfe Hefter jî di 3'yê çileyê de di televîzyona El Hadatê de axivîbû û li hemberî mudaxeleya dewleta tirk banga 'seferberî' û 'cîhadê' kiribû. Di warê mayîndebûna agirbesta li Lîbyayê de gumanên mezin hene, ji ber ku yek ji garantorê agirbestê dewleta tirk e. Ev jî îhtîmala çareseriyê kêmtir dike.

Leşkerên tirk naxwazin

Li gorî metnê peymana ku di malpera erebî ya televîzyona El Erebiya ya alîgirê general xelîfe Hafter de hat weşandin, hat diyarkirin ku tê xwestin Tirkiye şandina eskeran a ji bo Lîbyayê rawestîne. Di pêşnûmaya peymanê de van xalan cih girtibû: "Divê Tirkiye şandina leşkeran a ji bo Libyayê rawestîne. Divê agirbest di bin çavdêriya aliyên navneteweyî û saziyek bê alî ya YE'yê de bidome. Divê her du alî jî bê şert hêzên xwe yên çekdar bişînin baregehên wan. Divê tenê li çareseriya siyasî bê gerîn. Divê hin mîlîsên çekdar dest ji çekan berdin. Divê erk û peywira xwe di navbera Trablûs û Bingazîyê de parve bikin."

Krîza heyî kûr dikin

Nûnerê Bilind ê Polîtîkaya Derve ya Yekitiya Ewropayê Josep Borell nerazîbûn nîşanî Rûsya û Tirkiyeyê da ku bi rengekî 'leşkerî' tevlî krîza Lîbyayê bûn û ev rewş şiband rewşa li Sûriyeyê. Borell destnîşan kir ku Tirkiye û Rûsya bi hevsengî li parçeyê rojhilat ê Deryaya Spî guhertin, dê heman rewş li Lîbyayê jî rû bide. Borell anî ziman ku Moskova û Enqere 'çek û leşkeran' dişînin Lîbyayê.

Di sala 2015'an de li Fasê peymana Skhrîat, di 1 û 2'yê tîrmeha 2017'an de û di gulana 2018'an de civînên li Parîsê, di mijdara 2018'an de konferansa Palermoyê û di sibata 2019'an de jî peymana Abû Dabiyê hatibûn kirin. Ev peyman bûbûn sedema hêviyan lê bi ser neketibûn. Rewşa heyî nîşan dide ku ew ê krîza hîn bidome.

Ji 26 partiyan banga yekitiyê

26 partiyên kurd yên li Sûriyeyê ji bo yekitiya neteweyî gavek nû avêt û bang kir ku bê şert û merc bên gel hev. 26 partiyên siyasî yên kurd bi daxuyaniyeke nivîskî bang li yekbûna ref û helwestan kir. Her wiha bang li hemû hêzên kurdistanî, rêxistinên çandî, dezgehên çapemeniyê, kesayetên olî, civakî, çandî û tevahî gelê kurd kir ku rola xwe ya rasteqîn di pêkanîna yekitiya refa kurdî de bilîzin. Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin kurd li Sûriyeyê û bi taybetî li herêmê di mercên gelekî dijwar û qonaxeke dîrokî re derbas dibe. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Bi kiryaran dixwazin demografiya herêmê biguherînin. Gelê kurd înîsiyatîfa fermandarê giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) ji bo pêkanîna lihevkirina kurdî-kurdî, pêşwazî kir ku wê helbet pêşwaziya her kar û xebatên di vê di der barê de bike. Em bang li partiyên kurd ên li Sûriyeyê dikin ku bêyî şert li hev kom bibin û pirsgirêkên xwe nîqaş bikin." ***QAMIŞLO***

Li dijî kurdan li hev civiyan

Trafîka di navbera Rûsya, rejîma Sûriyeyê û Tirkiyeyê de berdewam dike. Hefteya borî li Moskovê li gel civîna agirbesta ji bo Lîbyayê, civînek din jî di navbera hêzên îstîxbaretê yên Tirkiye û Sûriyeyê de pêk hat.

Serokê Rûsyayê di hefteyên borî de çû Şamê û hevdîtin bi serokê rejîma Sûriyê Beşar Esad re kir. Piştre jî berê xwe da Tirkiyeyê û bi serokê wê Recep Tayyîp Erdogan re civiya. Piştî hevdîtinan, li Moskovê bi tevlîbûna îstîxbarata Rûsya, Tirkiye û rejîma Sûriyeyê civîneke din pêk hat.

Li gorî nûçeya di SANA' yê ya girêdayî rejîma Sûriyeyê hatiye parvekirin de, li Moskovê civînek di navbera Serokê Buroya Ewlehiya Neteweyî Elî Memlûk û serokê îstîxbarata tirk Hakan Fîdan de pêk hat. Li gorî nûçeyê di civînê de lihevkirina der barê Idlibê de, vekirina rêya Heleb-Laziqiyê û Heleb- Hema hatin gotûbêjkirin. Mijara herî girîng jî rewşa kurdan û hêza parastina kurdan bû.

Sekreterê Partiya Demokratîk a Kurd ên Sûriyeyê (El-Partî) Nisiredîn Îbrahîm têkildarî civînê diyar kir ku lihevkirina Tirkiye, Rûsya û Sûriyeyê xetereyek e û got: "Di rastiya xwe de rêxistinên li dijî gelê kurd û yên ku Kurdistan dagirkirine, amade ne her tiştî bikin. îsbata vê yekê jî civîna Moskovê ye. Bêguman ev lihevkirin di çarçoveya lihevkirinên berê de ne. Ev lihevkirin dê li Sûriyeyê aloziyê kûrtir bike. Tiştên îro diqewimin ji bo lawazkirina hêza Meclisa Sûriyeya Demokratîk, Rêveberiya Xweser a Demokratîk û hêzên wê yên leşkerî HSD, YPG û YPJ`yê ye."***KOBANÊ***

Xweşkanî

Felemez Ulug

Lêgerîna desthilatdariyê

Rûsya ji despêkê ve girîngiyeke mezin dide erdnîgariya Rojhilata Navîn. Di pêvajoya şerê sar de jî her çiqas xwestiye ku xwe li vê herêmê bi cih bike, hevsengiyên bi siyaseta navneteweyî hatibûn avakirin ji bo wê astengiyên herî mezin bû. Îro Rûsya aktorekî sereke yê vê siyasetê ye. Lewma ev jî ji bo Rûsyayê derfet û xeteriyên mezin bi xwe re derdixe holê.

Di navbere Amerîka û Rûsyayê de piştî serdema şerê sar bi dawî bû û şûnde cara yekem ev her du hêz di vê astê de nêzî hev dibin. Bi saya vê nêzîkayê Rûsya ket nav hewildanên pêkanîna xewna xwe ya sedsalê. Ji despêkê ve armanc û daxwaza Rûsyayê ew e ku ew bikaribe xwe di Rojhilata Navîn de bi cih bike û di warê siyasî û leşkerî de bandora xwe li ser Deryaya Spî jî ava bike.

Ev pêvajo bi mudaxeleyên şerê Sûriyeyê ve bandora xwe ava kir. Bi Tirkiye û Lîbyayê ve berdewam dike. Di roja me ya îro de Rûsya di çarçoveya vê planê de nêzî dewletên herêmê dibe. Lê rêveberiya Moskovayê di bi xetere û zehmetiyên vê pêvajoyê dizane.

Pêşketin û bûyerên li ser erdnîgariya Rojhilata Navîn diqewimin wekî berê bala Amerîkayê nakişîne. Ji ber ku Amerîka bi tifaqên xwe projeyên xwe li herêmê pêşdixe. Her tim li herêmê di pozîsyoneke stratejîk de ye. Lewma ew çalak nebe jî û yekser mudaxeleyî bûyera ango pêvajoyê neke jî ew dizane her tim hêza diyarker ê yekem e.

Rûsya ger wê li herêmê bi hêzeke wisa re têkeve nav pêşbaziyê, pêwîst e bi qasî siyaseta xwe û şêwaza xwe ya mudexaleyê guhertinan çêdike. Di nav xwe de reforman li pêş dixe. Hefteya borî Serokdewletê Rûsyayê Vlademîr Pûtîn di axaftina xwe ya vekirina meclisê de, diyar kir ku ev pêvajo dest pê kiriye.

Di axaftina xwe de Pûtîn gelek mijar nirxandin. Ji van mijaran a herî girîng û pêwîst mirov bi baldarî bişopîne ew e ku dixwaze di makezagona Rûsyayê de guhertinan çêbike. Ev guhertinên mîna lêgerîna berdewamkirina desthilatiya Pûtîn tên nirxandin, di halê heyî de bi temamî nehatiye fêmkirin.

Bêguman ev li Rûsyayê tê wateya destpêkirina pêvajoyeke nû. Di vê pêvajoyê de kesê herî nêzî Pûtîn û her wiha Serokwezîrê Rûsyayê Dîmîtrîy Medvedev e, li ser daxwaza Pûtîn ji erka xwe îstîfa kir. Di heman rojê de hat ragihandin ku Medvedev wek cîgirê Konseya Ewlekariya Rûsyayê hatiye peywirdarkirin. Pûtin beriya sala 2024'an dixwest bi formûlekê erka xwe berdewam bike. Yan jî ji xwe re statûyek serokdewletiyê çêbike. Bi vê hemleyê ve mirov dikare bêje; lêgerînên Pûtîn û siyaseta Rûsyayê ya Rojhilata Navîn di nav nakokiyan de ne. Bi vî halî gelo Rûsya wê çiqas bikaribe li ser siyaseta Rojhilata Navîn ango siyaseta global a cîhanî bandoreke erênî ava bike. Bêguman bersivên pirsan di nav dîwarên Kremlîn de ne.

Pirseke din a girîng jî ew e ku gelo ev pêvajoya lêgerîna desthilatdariyê ji hêla hêzên navneteweyî ve çawa tê nirxandin? Ew ê dîrok vê nîşanî bide.

Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de eşîrên kurd

Bi destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekemîn, bakurê rojhilatê Kurdistanê gavbigav tê dagirkirin. Di sala 1915'an de dagirkeriya Ûris a li heremên Serhedê her diçe zêde dibe. Di vê navberê de bi sedhezaran ermen ji aliyê artêşa Osmanî û çekdarên kurd, çerkez, tirk ve tên qetilkirin. Ji ber vê sedemê hêzên ermen ên di nav artêşa Ûris de cih girtine, dikin ku ji kurdan tolê hilgirin; lewma eşîrên kurd neçar dimînin û dibin alîgirê dewleta Osmanî.[1] Li ser hewildanên Ebdurezaq Bedirxanê alîgirê Ûris, serekê alayên eşîra ertoşiyan derbasî aliyê Ûris dibe, lê çend roj şûn de li herêma Elbaqê ji aliyê "Teşkilat-ı Mahsusa" (îstixbarata Jon Tirkan a hemdemî) ve tê kuştin.[2] Îttihatçî di van salan de hewil didin ku êdî Kurdistanê bê ermen û kurd bihêlin.

Di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, dewleta Osmanî dixwaze ji alayên eşîran baştir îstifade bike. Bi vê armancê wan jinûve saz dike, vê carê jî navê van alayan dike "Alayên Îhtiyatî yên Siwarî" û wan bi Artêşa Çaremîn ve girêdide. Li gor arşîvan, di wîlayeta Erziromê de 5 alay li Xinûsê, 2 alay li Hesenqeleyê, 6 alay li Agiriyê, 2 alay li Bazîdê; di wîlayeta Wanê de 2 alay li Erdîşê, 2 alay li Bêgiriyê, 2 alay li Qelqeliyê, alayek li Elbakê, alayek li navenda Wanê; di wîlayeta Bitlîsê de 2 alay li Milazgirê; di wîlayeta Dîyarbekirê de alayek li Cizîrê, alayek li Sêwerekê, alayek li Wêranşarê û 2 alay jî li Mêrdînê tên bicihkirin.[3] Paşê bi beşdarbûna tevahiya van alayan, qolordiyek siwarî derdikeve holê ku bajarên wek Erdîş, Agirî, Xinûs, Wêranşar û Wanê navendên vê qolordiyê bûn. Serleşkerên van alayan serbazên Osmanî bûn û serekên eşîran jî berdestiyê wan bûn.

Sedat Ulugana

Di despêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn de, dewleta Osmanî dixwaze ji layên eşîran baştir îstifade bike. Bi vê armancê wan jinûve saz dike û vê carê jî navê van alayan dike "Alayên Îhtiyatî yên Siwarî" û wan bi Artêşa Çaremîn ve girêdide

Li ser dagirkirina Agiriyê ya ji aliyê Ûris ve, peywira vê qolordiya ku ji Alayên Îhtiyatî yên Siwarî çêbûye dibe girtina xeta Xamûr-Elajgirê (Zêdka).[4] Dema ku şer li hêla Erziromê dijwar dibe, Enwer Paşa pêngava Sariqamûşê dide destpêkirin, di encama vê pêngavê de hema bibêje dewleta Osmanî artêşa xwe winda dike. Nêzî 60 hezar leşker li çiyayên Allahûekberî diqerisin û dimirin. Di nav wan de 5 hezar kes jî endamên Alayên Îhtiyatê yên Siwarî bûn. Piştî ku pêngav bi ser nakeve, wek leşkerên artêşa Osmanî, endamên alayan jî direvin û dibin firar. Ji aliyekî ve mafdar bû ku dewletê tu tişt nedabû wan, di destên wan de tenê tivingên martînî yên bêkalîte hebûn, heta cil û bergên wan jî ji kîsê wan bûn. Li aliyê din, dewletê di bin navê "seferberlîk"ê de ji eşîran her tişt standibûn ku vê yekê jî debara wan xistibû xetereyeke mezin.[5] Lê alay dîsa jî li ber xwe didin û li hin deran bi ser dikevin. Mînak, serekê alaya eşîra Cîbran a duyemîn Xalit Begê Cibrî di şerê Hesenqelayê de derbeyên giran li Ûris dixe û lewma bi rutbeya "Albay"tiyê tê teltîfkirin; Ebdulmecîd Begê Sîpkî di şerê bi şûran de ji şanzdeh cihên xwe birîndar dibe,[6] lê dîsa jî Ûris têk dibe. Di vî şerî de Ebdulmecîd Beg topeke Ûris desteser dike ku ev yek bûye mijara kilamên dengbêjan jî.[7] Di van rojan da Qadir Cemîl Paşa (ku wê demê zabit bû) Ebdulmecîd Beg ziyaret dike û dibe şahidê wan mercên xerab ên ku alayên eşîra Sîpkan tê de bûn. Heta wisa ku çawişekî ji artêşa Osmanî ferman dide Ebdulmecîd Begê ku rutbeya wî albay e.[8] Kor Huseyn Paşayê serekê alayên eşîra Heyderî Ûris li Koprîkoyê dide sekinandin. Merûf Axayê serekê alaya eşîra Bekiran li Geliyê Zîlan dîsa pêşiya Ûris dibire ku heya jiyana xwe ji dest dide. Alayên kurdan bi can û dil li hemberî Ûris şer dikin. Dizanin ku dema dîl bikevin, fedaiyên ermen ên di nav artêşa Ûris de cih digirin wê ji wan heyfa xwe hilgirin. Lewma sûbayên Osmanî jî her dem vê tirsê tînin bîra wan. Lê ev hewldanên alayan ên dilsoz jî têra rawestandina Ûris nakin û di adara 1916'an de Bedlîs û Mûş ji aliyê Ûris ve tên dagirkirin.

Dema ku Ûris dikeve Serhedê, hema bêje tu leşkerên Osmanî li wir namînin. Hêzên herêmî jî belawela bûne û hinek ji wan jî bi malbatên xwe ve reviyane herêma Diyarbekir û Rihayê. Piştî ku artêşa Osmanî hêzên xwe yên Çeneqeleyê dikişîne herêma Bedlîsê, bilez ji hêzên kurdan ên herêmî û binmayiyên Alayên Îhtîyatî yên Siwarî yekîneyên nû çêdike û navê van yekînayan jî dike "Alayên Milîsan ên Minekar". Vê carê di nav van alayan de serekên wek Fetilla Begê Hesenî, Kor Huseyn Paşayê Heyderî tune ne, ew bi malbatên xwe ve çûne. Lê Ebdulmecîd Begê Sîpkî, Hecî Mûsa Begê Xweytî, Cemîlê Çetoyê Pencînarî û Mala Eliyê Ûnisê Qewmê Çiyê li cihê xwe mane û li hemberî Rûs şer kirine. Tiştekî din ê balkêş jî ew e ku di nav vê pergala leşkerî ya nû de êdî yekîneyên ku serektiya wan şêx û meşayîx dikin hene.

Alaya Eşîra Xweytî ya Siwarî di bin emrê Hecî Mûsa Begê Xweytî de di Geliyê Bedlîsê de şer dike û nahêle Ûris derbasî herêma Botanê bibe. Yekîneyên bi navên Mufrezeya Şêx Seîdê Nûrsî, Tabûra Milîsan a Şêx Mesûm, Alaya Milîsan a Şêx Şerîf, Alaya Milîsên Darikî, Alaya Milîsên Eşîra Xiyan, Tabûra Milîsên Pencînarî, Alaya Milîsan a Cemîlê Çeto, Tabûra Milîsên Çepaxçûrê û Tabûra Mala Elîyê Ûnis (Tabûra Milîsên Sasonê) jî li çar aliyên Bedlîsê şer dikin.

Bi taybetî, Mufrezeya Seîdê Nûrsî heya tevî şerê ku di navenda Bedlîsê de diqewime dibe û li Gokmeydanê bi şûr û xenceran şer dike. Di dawiya vî şerî de, Seîdê Nûrsî û xwendekarê wî yê meşhûr Ebdurahîm Rehmî Zapsû dîl dikevin. Dema ku herêma Bedlîsê bi tevahî dikeve destê Ûris, êdî li xeta Botanê jî tevahiya kurdan çekan radikin. Di xeta Darahênê, Qulp û Dêrsimê de alayên nû tên çêkirin, ji van alayan yek jî Alaya Milîs a Eşîra Hesenanli ya Duyemîn bû ku serekê wê jî Seyîd Riza bû.[9]

Geliyê Zîlan herêmeke çîyayî ye ku dikeve bakurê behra Wanê û bi şiklê îdarî bi Erdîşê ve giredayî bûye heya roja me. Gelî, ji sê çiqan pêk tê; Çiqa Hecîdêran, Çiqa Hemoyan û Çiqa Bekiran. Van çiqan navên xwe ji heman eşîran (Hecîdêrî, Hemoyî, Bekirî) girtine. Dema ku Alayên Hemîdiyê hatine çêkirin, van her sê eşîrên mezin û eşîra Kalkî, Îskî û Mikaîlî konfederasyoneke bi navê "Ademan" ava kirine û tevî alayan bûne. Eşîrên din ên herêmê yên bi navên Torin, Xeloyî, Ecoyî tevî konfederasyona "Heyderî (Heyderan)" dibin. Ev her du konfederasyon paşê Geliyê Zîlan di navbera xwe de beş dikin ku sînor jî "Çemê Geliyê Zîlan" bûye. Di herêmê de hem alayên Heyderan û hem jî alayên Ademan hebûne. Ev her du konfederasyonên eşîran çend caran ji bo zozanên wek "Tucî", "Gulîzer" û "Walî Beg" êrîşî hev kirine. Her çiqas Mela Mihemedê Zîlanî ji eşîra Hecîdêrî bû jî, gundê wî (Bonizî) diket di nav erdê konfederasyona Heyderan. Lewma ew jî êdî di nav alayên Heyderan de cih digire. Lê dema ku "Alayên Milîsan ên Mînekar" pêk tên, êdî rola konfederasyona Ademan zêde çênabe. Alayên Geliyê Zîlan (di fermiyetê de alayên Erdîş, Elcewaz û Panosê) bi taybetî dikevin bin emrê Kor Huseyn Paşayê Heyderî. Serekên alayên Ademan ên wek Mihemedê Evdî Axayê Mikaîlî firar bû, Qulîxanê Heso (ji ber ku dema Wan ketibû destê Ûris, wî jî Erdîş û Çaxirbeg talan kiribûn) girtî bû, Silêmanê Mamê (ji ber ku tevî operasyonên li dijî Şêx Şabedîn bûbû) ji aliyê gel ve hatibû îzolekirin û Meroyê Biro jî ji aliyê Ûris ve hatibû kuştin. Lewma êdî li herêmê tu reqîbên Kor Huseyn Paşayê Heyderî nemabûn. Dema ku beşek ji alayên Milîsên Ademan (taybetî ji eşîrên Bekiran û Hemoyan) bi mînekarî derbasî aliyê Kor Huseyn Paşa dibin, Paşa jî çend gundên Elcewazê (Qerekeşîş, Axçira, Arînçkûs, Xornas, Pargat, Sîpan ku berê ev gund ên ermenan bûn û paşa ew talan kiribûn) dide wan. Dema ku Ûris ji Wanê vedikişe, êdî li herêmê tenê yekîneyên ermenan dimînin. Qulîxanê Heso vê firsendê baş bi kar tîne, (ku ji hefsê reviyabû) ji çiyê berjêr dibe û tevî eşîrên din êrîşî Erdîşê dike û Erdîşê ji ermenan distîne. Ji ber vê yekê, ji aliyê dewletê ve tê efûkirin.[10]

Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku yekîneyên leşkerî yên kurdan peywira xwe baş anîne cih. Piştî ku komara Tirkiyeyê tê avakirin, êdî hewcehî bi van yekîneyan zêde namîne û di nav 15 salan de serekên van alayan tên tesfîyekirin. Kor Huseyn Paşa, Ebdulmecîd Begê Sîpkî û Hecî Mûsa Beg ji ber ku piştgiriya Şêx Seîd kirine, tên mişextkirin. Paşê Hecî Mûsa Beg û Kor Huseyn Paşa direvine Sûriyeyê, li wir Hecî Mûsa Beg nexweş dikeve (dibe zatûre) û di sala 1928'an de dimire; Kor Huseyn Paşa ji aliyê lawê wî yê bi navê Medenî ve di 1929'an de tê kuştin. Ebdulmecîd Begê Sîpkî li mişextiyê (Qeyserî) di sala 1930'an de ji ber krîza dil dimire. Esedê Xalit, di salên 1920'î de li gor îdiayan dewlet jehrê didê û ew dikuje. Seîdê Nûrsî jiyana xwe li mişextiyê derbas dike. Xalit Begê Cibrî di 1925'an de û Seyît Riza jî 1938'an de tên dardakirin.

Dewlet dîsa jî wek saziyeke alîkar "milîstî"yê ji holê ranake û diparêze; alîgirên xwe yên eşraf û di çarçoveya feodalîteyê de endamê eşîrên bêhêz û bêpopularîte di bin vê saziyê de berhev dike û di serhildanên kurdan de (1921-1938) bi kar tîne.

Çavkanî:

1- *Prens Shachovsky û Kamil Bedirxan ji Çarê Ûris re raporekê dinivîsin, Aris Arda, "Sovyet Arşivinde Kürtler" www.newroz.com: " di destpêka şer de di bin serektiya Resûl Beg û Eyup Paşa (Eyub Paşayê Kaskî) de hejmareke pir ji Alayên Hemîdiyê derbasî aliyê me bûn. Lê sed heyf ku ew sûbay û tevahiya kesên ku derbasî aliyê me bûbûn re muameleyên xerab hatin kirin, dest dirêjî namûsa wan hat kirin, mal û milkê wan hatin talankirin. Ev jî bu sedem ku yên din nebin alîgirê me. Minak, Hesen Begê Hertoşî di serî de bi xwesteka xwe teslîmî Ûris bûbû. Lê ji wî re pir bêedebî hat kirin û ew jî ji me reviya û paşê jî bû dijminekî çavsor ê Ûris. Bi teşwîqkirina Ermeniyan, leşkerên Ûris zulmeke mezin li Kurdan kirin. (...)"*

2- *Celîlê Celil, Otobiyografya-Abdurezzak Bedirhan- wer: Ahmed Cuni, Peri, İstanbul, 2000, r36*

3- *Ahmet İhsan ve Şürekası, Ordu Salnamesi, Matba-i Osmani Şirketi, İstanbul, 1332, r.900-960*

4- *Emekli Kurmay Yarbay Süleyman İzzet Yeğinatı, Büyük Harbin Başında 2. İhtiyat ve Nizamiye Süvari Tümenleri ile Aras Cenup Müfrezesinin Muharebeleri, Genelkurmay Başkanlığı Askeri Matbaa İstanbul, 1939, r.14-17*

5- *Birinci Dünya Harbinde Türk Harbi, Kafkas Cephesi, 3. Ordu Harekâtı, cild.2, Genelkurmay Başkanlığı Yayını, Ankara 1993, r. 39*

6- *Mehmet Şerif Fırat, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara, 1983, r.143*

7- *Ev kilam ji aliyê Dengbêj Reso û Dengbêj Şakiro ve hatiye gotin:*
(...)
Hey dunyayê ax hey dunyayê hayê hayê
ezê li diyarê Dutaxê diketim
bi dar û bî ye
hucûm hucûma bavê Xalis Kekê Mexsê ye
(...)
bi zora şûr ajotiye li ser topê ye topa Ûris standiye ji destê alayê ye
hey wayê ax dunyayê hey wayê

8- *Zinar Silopi (Kadri Cemil Paşa), Doza Kurdistan- Kürt Milletinin 60 Seneden Beri Esaretten Kurtuluş Savaşı Hatıratı, Stewr Basım evi, Banever, 1969, r.39-41*

9- *ATASE Arşivi, Klasör: 2673, Dosya: 178, Fihrist: 5-2*

10- *B.C.A, No.30-18-1-1 / 4-49-1 (20 sibat 1338)*

Ziwanê kirmanckî de eserêko newe vejîya

Wêşanxaneyê J&Jyî ra bi ziwanê kirmanckî de yewna eserêko newe vejîya. Nuştoxê kitabî Suleyman Yilmazî seba ke namdarê kurdî nêrî vîrîkerdene û neslê neweyî zî înan bişinasnî kitabêko bi nameyê 'Namdarê Kurdan' vet

Nevîn Alkan

Zanayîş, huner, tarîx, kultur, edebîyat, deyr, deyrbazî, folklor û heta şer zî tede xeylê çîyî kitaban ra yenî musnayîş. Kitabî tarîxê nuştekî yê nê çîyan î. Her çiqas ke eserê nuştekî yê ziwanê kirmanckî kêmî bibî zî serranê peyênan de no het de averşîyayîşêk virazîyayo. Averşîyayîşê tarîxê nuştekî bibî zî eke ziwan nêro qiseykerdene ver bi çinbîyayîşî şono û yeno vîrîkerdene. Xora goreyê cigêrayîşê UNESCOyî, kirmanckî ver bi tehlukeyê vindîbîyayîşî de yo. Seba daîmîkerdişê ziwanî, ganî ziwan neslanê neweyan rey de bêro qiseykerdene û cigêrayîşê raştîyan bêro kerdene.

Seke Mamoste-Nuştox Suleyman Yilmazî zî kitabê xo yê bi nameyê 'Namdarê Kurdan' de vato 'Tarîxzanê serdestan, tarîxê kurdan sey çinbîyaye hesibnayo' seba vîrîkerdiş û çinkerdişê ziwan û kulturê no şarî her tewir kerdiş ameyo û yeno kerdiş. Merdim tarîx û edebîyatê xo kitaban ra museno. Nuştox Suleyman Yilmazî seba ke namdarê kurdî nêrî vîrîkerdene û neslê neweyî zî înan bişinasnî kitabêko bi nameyê 'Namdarê Kurdan' vet. Kitab de qala hunermend, şaîr, kaybazê sînema, derybaz, serkêşê xoverdayîşan yê kurdan, şorişgerê kurdan, ziwanzan, nuştox, rojnameger û sewbîna xeylê namdaran yeno kerdene. No kitab de qala tarîxê kurdan yeno kerdene û wêşanxaneyê J&Jyî ra vejîya.

Suleyman Yilmaz dewa Zeydanî ya pabesteyê qezaya Pîranî ya Amedî ra yo û mamosteyê mektebî yo. Yilmazî Şûbeyê Amedî yê Egîtîm-Senî de Sekreterî kerdo û Kurdî-Derê Amedî de dersê kirmanckî dayo. Sewbîna zî Rojnameyê Azadiya Welat ke bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) ame padeyene de nuşteyî nuştî û nika hema zî cayê cîyayan de nuştişê xo domneno. Mi derheqê babete de nuştoxê kitabê 'Namdarê Kurdan' Mamoste-Nuştox Suleyman Yilmazî de qisey kerd û ey ma rê qala kitabê xo kerd.

Edebîyat û netewbîyayîş

Yilmazî destpêkê qiseykerdişê xo de qala ziwan û edebîyatê kurdî kerd û va: "Eke yew ziwan aver nêşêro û dewlemend nêbo eserê hol û namdarî nînê nuştiş. Sebebê na rewşe estê. Hetêk de polîtîkaya asîmilasyonî esta. Ziwanê ma ser de tedayêka verê esta. Nê wextê Siltan Abdulhamîtî ra dest pêkerdo û heta ewro dewam kerdo. Eke ziwan aver nêşêro, nasnameyê netewî zî zehif maneno. Wexto ke ziwan dewlemend bibo û aver şêro,

hem edebîyat û kulturê kurdan û hem zî edebîyatê dinya rê xizmetêko pîl beno. Xora eke edebîyat dewlemend bibo ziwan zî aver şono. Eke edebîyatê kurdî aver şêro, namdarê kurdî zî do bêrî nuştiş. Hîkaye, roman û şîîrê edebî, nasnamebîyayîşî de faktorê muhîman ra yî. Edebîyat netewbîyayîş de rolêko muhîm kay keno."

Namdarê kurdî nînê zanayene

Yilmazî dewamê qiseykerdişê xo de qala sebebê nuştişê nê namdaran kerd û wina va: "Ma kurdî namdaranê sewbîna şaran baş şinasnenî û heyatê înan zanî. Feqet namdaranê kurdan nêzanî. Nê namdarê ke mi portreyê înan nuşto, ziwan û kulturê kurdan rê xizmetêko pîl kerdo. Seba ke kurdî azad bibî, kurdkî azad bibo û aver şêro xizmetêko zaf pîl kerdo. Wexto ke ma portreyê nê namdaran wanenî, ma derheqê ziwan û kulturê kurdan de malumat herînenî. Yanî hîssîyatê neteweyî aver şono. Wexto ke ma înan wanenî ma tarîxê xo bander benî."

Ganî ziwan bêro şixulnayene

Yilmazî dîyar kerd ke kurdî heta ewro azad nêbîyî û kurdkî wayîrê statu nêbîyo' û va: "Coka ra edebîyatê kurdan aver nêşîyo. Wexto ke kurdî biameyêne qalkerdene û nuştene, bedel ameyêne waştene. 1970an de kurdî qalkerkdiş û nuştiş bedelo pîl waştêne. Edebîyatê kurdî tepîya mendo. Ma na babete tay girê da ziwan, la kirdkî hîna zêde tepîya mendo. Sebebê na rewşe vîşêrê nê çîyanê ke ma vatî oyo ke kirdê ma cayanê cîya-cîyan de cuwîyenê û sewbîna zî mezhebê înan cîya-cîyayo. Aye ra fekê cîya-cîyayî ameyî meydan. Na ra wexto ke dêrsimijêk û pîranijêk yenî tê het yewbînan ra fehm nêkenî û tadîyenî tirkî ser. Cîyabîyayîşê nê fekan zî polîtîkayê asîmîlasyonî vera yo. Ganî kirmancî ziwanê xo ser de bivinderî û ziwanêko ortax ke her kes yewbînan ra fehm bikero qisey bikerî. Heta ke ma ra bêro ganî ma rojnameyan, televîzyon û radyoyan de ziwanêko ortax bişixulnî ke şarê ma, ma ra fehm bikero. Wexto ke ziwan de yewîye biba, na rewşe do netewbîyayîşî rê zî xizmet bikera. Tay grûbê ma estî ke ziwan rê xizmet kenî. Feqet lazim a ke xebatêka hîna hîra bêra viraştene. Ganî kirdkî ser o xebata standartkerdişê ziwanî bêra kerdene. Nê rojanê verênan de tora kurdkî û nasnameyê kirdî virazîya. Torêka muhîm a. Tirkîya û teberê welatî ra xeylê ziwanzanî zî tewrê kombîyayîşî bîyî. Pêşnîyazê muhîmî virazîyayî. Tabî binê tore de kirmancê ma zî estbî. Ma wazenê ke binê sîwanê tore de pêşnîyazê ma zî bêrî girewtene."

Rolê medyaya komelkî

Yilmazî qiseykerdişê xo yê peyênan de seba wayîrvejîyayîşê ziwanî veng kerd û va: "Medyaya sosyal rolêko pîl kay kena. La ez ewro ewnîyena embazê ma, ciwanê ma, roşnvîrê ma bi tirkî nusenî. Mîsal merdimêk wefat keno, îlanan bi tirkî nusnenî. Beno ke ê kesî tirkî nêzanî zî. Ma mesajanê xo tirkî nusenî. Ganî ma pê ziwanê xo kar bikerî, ganî ma bi ziwanê xo sîyaset bikerî û heme cayan de bi ziwanê xo qisey bikerî. Ziwanê ma keyeyê ma yo, ziwanê ma nasnameyê ma yo û ziwanê ma hafizaya neteweyî xo mîyan de hewêneno. Merdim bi kamî ziwanî qisey bikero, bi aye ziwanî fikirêno. Fikir û ziwan pabesteyê yewbînan î."



Edebîyat, fikir û ziwan pabesteyê yewbînan î

Yilmazî qiseykerdişê xo yê peyênan de wina va: "Şarê ma bi taybetî zî ciwanî ganî ziwanê xo û tarîxê xo bizanî. Eke ma tarîxê xo nêmusî, ma do bêkok bimanî. Merdim tarîxê xo ra ders gêno û ameyoxê xo tayîn keno. Ma zî û ziwanê ma zî yewê ra cêr nîyî. Kompleksêke ma çin o. Xora ganî merdim sewbîna ziwanan zî bizano. La ganî her çî ra ver ma ziwanê xo bizanî û xizmetê ziwanê xo bikerî. Omidê ma esto ke ciwanê ma do wayîrê ziwanê xo bivejîyî. Çimkî ma wayîrê nasname û ziwanê xo nêvejîyî, ma werte de helîyenî. Kulturê ma bavûkalanê ma ra sey mîras ma rê mendo. Ganî ma wayîrê ci bivejîyî.

Selahîyetdarî çira seba Dêrsimî bêveng manenî?

Merkezê Xeberan

Wendekara Beşa Averberdişê Domanan ya Unîversîteya Munzurî Gulîstan Doku (21) 5ê çeleyî ra nata vindîbîyaye ya. Zaynal Abarok eslê xo de Rûsya ra yo û nameyê ci hedîse de vêreno werte de nêaseno. Abarokî Rûsya de bîyo pîl û bado ke dayîka ci polîsêk reyde zewijyaya Dêrsim de sey lajê polîsî ciwîyeno. Badê ke çalakî û aktîvîteyî zêdîyayî, walîtîya Dêrsimî seba 15 rojan bajar de heme aktîvîteyan qedexe kerde. Walîtîye îdîa kerde ke nêrazîbîyayîşê ke yenê mojnayene 'Şar teşwîq kenê û dişmenîye kenê'. Embazê Dokuye zî vinîyayîşê Dokuye ra nata çalakîyan virazenî. Rektor Ubeyde Îpekî waşt ke wendekarî çalakîya xo biqednê. Labelê wexto ke wendakarî serebûtê Cem Tekînogluyî vist vîrî 'wendekarê cinîyî yê unîversîteye tacîz kerdbi' rektor kampus terikna. No zihnîyet vera 17 serran de 15 hezarî ra zêdêr cinîyî hetê kesanê tewr nêzdîyê înan ra ameyî kiştene û hema zî yenî kiştene. Çîyo balkêşin ra yew zî oyo ke Dêrsim de hedîseyê îstîsmarî virazîyayî û virazîyenî. Dêrsim de 5 aşmanê peyênan de 4 hedîseyê îstîsmarî qewimîyayî. Ame zanayene ke qezaya Pêrtagî ya Dêrsimî de xeylê domanê lajî yê 11 û 16 serrî raştê îstismarê cinsî ameyî. Qerarê nimitişî dîya tehqîqatî ser. Verê cû Cizre de, Çewlîg de û Mêrdînî de serebûtê îstîsmarî amebî meydan. La derheqê nê pêro serebûtan de qerarê bêteqîbîye ameye dayene. Çi tesadufo ke wexto ke cinî û domanî yenî mexdurkerdene qerarê nimitişî dîyeno dosyayanê kerdoxan ser, kerdox yenî nimitene, nînê eşkerakerdene û nînê cezakerdene. Na rewşe de hûmara hedîseyanê winasîyan zêdîyena. Sîtemo serdest paştî dano camêrdan. Reaksîyon û vengê xurtî nînê nawitene ke serdestî hêzê şarî ra bitersî û mecbur bimanî ke rayraberdişê welatî bibedilnî. Derheqê nê babete de çîyî yenê nimitene. 10 serranê peyênan de îstîsmarê vera domanan se ra 700 zêdêr bîyo. Merdim bawer nêkeno ke selahîyetdarî na rewşe nêvînenî.

Yanî çîyo ke ma wazenî vajî oyo ke heme hedîseyan de gişta camêrdo serdest û îqtîdarî esto. Zihnîyeto camêrd o serdest bi serran o dewre de yo. Mumkun nîyo ke nêkerdişanê ke vera cinî û domanan de yenî kerdene nêvînî, labelê hesabê înan de tena berjewendîyê şexsî esto. Coka ra çimanê xo padanî û goşanê xo gênî. Lal û koran kay kenî. Çimkî no hawa înan rê asan yeno û menfîetê înan netîce de esto. Helbet no şar do rojêk biteqîyo û hesabê nê çîyan biperso. Ganî komel hemverê nê hedîseyan de bibo yew veng. Hende serran de çîyo ke nêameyo sereyê cinî û domanan ser nêmendo. Bajarê kurdan çargoşe bi kamerayanê averşîyayeyan ameyî girewtene. Bi leşker, cendirme, polîs û tîmanê taybetan ameyî dagirkerdene. Senî beno ke wexto ke qala îstîsmar û cinîyêk yeno kerdene tu selahîyetdarêk ra vengêk nêvejîyeno û werde de nêasîyenî. Xeberanê ke ameyî weşênayene de vejîya werte ke serebûtê îstîsmarî yê Pêrtagî hetê çeteyêkî ra serra 2004î ra nata dewam keno û kargeho ke dîmenê îstîsmarê domanan amebî antene hetê polîsan, leşkeran û notiran ra tim ameyêne zîyaretkerdene. Aqilê merdiman nênakokîyan nêtepişeno ke cayêko winasî de hedîseyê îstîsmar û vindîbîyayîşî nêrî vînayene û nêrî zanayene. Qey merdim cayo ke zîyaret keno nêzano? Nê çîyî polîtîk î. Tewr peynî Dêrsim de vejîya werte ke hirê çawişê pisporî tecawizê cinîyêka 20 serrî kerdî. Seba nimitişê serebûtî destûr nêdîyeno ke nêweşxane de kesêk cinî zîyaret bikero. Aqûbetê cinîye nîno zanayene. Îqtîdaro serdest û camêrdo serdest yewbînan ra hêz gênî, yewbînan pawenî û yewbînan ceza nêkenî. Coka ra hserebûtî zêdîyenî.

Xêzkarê mêvan

Julian Peters



Julian Peters xêzkarekî bi nav û deng e û li bajarê Montereal Kanadayê dijî. Gelek xêzeromanên wî hene û hin pirtûkên qerfî veguhastine xêzeromanê û bi giranî helbestên klasîk xêz kirine. Me jî piştî destûra xêzkar xwest ku wî bi çend xêzan bikin mêvanê rûpelê xwe. Wergera gotinên van xêzan, ji aliyê Takyedîn Çîftsuren ve hatiye kirin.

Zimanên biyanî

Carekê geştiyareke alman hate serdana Amedê û xwest li nav sûrên wê yên dîrokî bigere. Piştî ku ew hinekî li nav sûran geriya û derbasî nav kolanên sûrê yên teng bû, riya xwe wenda kir û nema dizanî ew ê çawa vegere otêla xwe. Li kolanê du ciwanên amedî rawestiyabûn, jina geştiyar çû ba wan û bi almanî ji wan pirsî, lê ciwnan jê fêm nekir, bi îngilîz û fransî jî ji wan pirsî dîsa fêm nekirin, dawî bi îtalî ji wan pirsî dîsa bersiv nedan. Piştî ku hêviya xwe ji wan qut kir û çû, yekî ji wan ciwanan ji hevalê xwe re wiha got: “Welehî divê em hînî zimanekî biyanî bibin, carnan bi kêrî mirov tê.” Hevalê wî lê vegerand û wiha got: “Kuro dîno tu yê çi feydê ji zimanan bibînî û ew ê çawa bi kêrî te were, binihêre waye jinik bi 4 zimanan dizane, ka çi feyda wan jê ra çêbû.”

Şûjin

Dildarê Amedê

Ziringînî ji bin guhê we were!

Dema min nû bihîst ku kovareke xêzeroman bi kurdî derdikeve, kêfa min hat û dema min navê wê dît bêhtir kêfa min hat, min got de vaye êdî dora me ye ku em zrîngiyê ji bin guhê hemû kul û derdên xwe bînin. Lê min nizanibû ku dê ziringînî terpîn û reqîn û teqreq tev li serê me bêhtir kom bibin.

Ji roja ku ev Zrîng derketiye min rojeke xweş ji xwe re nedîtiye. Berê dema hinekan ji min dipirsî digot tu çawayî min digot, ‘teq û req îdare dike.’ Lê niha dema hinek vê pirsê dikin ez dibêjim, ‘teq û req û şerq û gum û fîrşelep’ û hîna jî ez nikarim derdê xwe bînim ziman.

Di meha ku Zrîng çap bû de, fatoreya min a ceyranê got fîrşeleq û du qatê berê hat...

Hîna hejmara duyemîn dihate amadekirin fatoreya me ya avê go terq û vê carê 3 qatê berê hat...

Kuro lawo dema we got Zrîng kêfa me hat û me got vaye dora me ye em ê ziringîniyê ji bin guhê vê dinayaya bêbext bînin lê mixabin me dît ku rewşa me ji berê xerabtir bû. Her carê ziringînî ji bin guhê me tê...

Xwedê û pêxemberê xwedê ji sersebeban re nehêle û birûskek ji ewrekî reş û tarî derkeve û bêje fîrşeleq û li bin guhê dedaşê bikeve û fatoreyên çend mehan tev bişewitin…

Tew piştî ku bajarên me ketin bin destê çeteyan, xelkê me perîşan û koçber bû.

Ez newêrim behsa rewşa siyasî bikim heke min wêrekî hebûya min ê ji we re behs bikirana ji dema Zrîngê û vir ve çend bajarên me hatine dagirkirin û wêrankirin.

Qirix ne bes bû bi ser de jî Recoyê Tersteqle hat. Îcar tersteqle, ma tu kevokî lawo, ez zêde newêrim bela xwe tê bidim niha belkî terspihîn jî zanibe lê bawer nakim ji ber ewqas sal hûn dûrî Amedê ketine û li kolanê Stenbolê şaşo maşo bûne êdî ne tersteqle, tu nikarî rastteqle jî bavêjî. Niha meriv a xwedê bêje di nav wan de Îmamê Cîcî gelekî cîcî û xweşik e û camêr bela xwe di kesekî nade.

Lê ew Tersteqele heye, ew bela xwe di her kesî dide û tiliya xwe dixe hemû kulmozan, heta carekê dûpişkek lê rast were.

Kuro lawo hûn bûne benîştê devê her kesî, wê rojê Şevreşê Rûtarî li ber dengê Hisênkê Omerî û di bandora gotinên strana ‘wey dilo dilo dilo, mala mêvaniya wilo, Hisênko cotkariya û terso ji xwe bihêviya.’ Helbesteke wiha li ser we nivisandibû û Zrîng wekî berpisiyarê hemû qede û belayên buhabûnê destnîşan kiribû û wiha digot:

Qirix hat û meşiya
Qelem xist nav tiliya
Bang kir Îmam Cîcîya
Tersteqle û çendek diya
Go min Zrîng ji we re aniya
Kovara xêzkariya
Xelo ji kêfa ziriya
Şevo rabû firiya
Malî rabûn ser piya
Hêlo li qerfê geriya
Ji kerban re giriya

Êdî wiha bi serê min hatiye ku ez dibêjim tingeting, xîzexîz, şelpeşelp, terqereq, ringering, şelpînî, çirke irk, reqereq, dimedim, şingeşing û hîna jî ez xwe nikarim îfade nakim.

Teşebiseke pêwîst û wêrek

Avakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî teşebiseke pêwîst û wêrek bû. Ger tor bikaribe xwe bigihîne hemû kurdan û cîgehên ku kurd lê dijîn, dê mekanîzmayên dînamîk di nav kurdan de ava bike

Zekî Gorur

Onto-polîtîkaya neteweyî û zimanî/çandî ya li ser kurdan li Tirkiyeyê zêde ji hev cuda nehatiye avakirin. Reftarên li dijî kurdan û ziman/çanda wan, di nav daîreyeke yekpare de ne û encamên wan jî bi hevdu ve girêdayî ne. Geşedan û serboriya kurdî li Bakur û li Tirkiyeyê di nav berxwedan û êrîşan de teşe girtiye. Ziman çiqas alava kolonîzekirinê be ewqas wek alava dekolonîzekirinê jî tê fehmkirin. Loma di wê onto-polîtîkayê de, bertek, îtiraz, keftûleft û berxwedana kurdan û kurdî jî, di nav wê daîreyê de encam daye. Ji ber vê rageşiya ontolojîk, kurdî nikare bibe meseleyeke asayî. Têkçûna wê jî, rewac û serkeftina wê jî bi vê onto-polîtîkayê ve girêdayî ye. Li aliyekî polîtîkayên zimankujî û çandkujiyê, li aliyê din berxwedana li dijî wê tê dayîn. Li aliyekî mekanîzmayên piştaftinê, li aliyê din hewldana têkbirina wan mekanîzmayan û berxwedana domdar a li dijî wê. Polîtîkayên pişaftinê, bingehîn, dîrokî û sîstematîk in, lê nemaze di 3-4 salên dawî de dozaja wan û encamên wan, alarm û hişyariyekê dide û bangewaziyekê li kurdan dike. Nexasim piştî pratîka qeyûman û vesazkirina sîstema dewleta tirk, êrîşên li ser ziman û çanda kurdî jî bi sîstematîktir tên meşandin. Ew polîtîka tenê ne Bakur, êdî di pratîkê de li Rojava jî tê meşandin. Helbet kêşeyên ziman û çanda kurdî meseleyeke piralî û berfireh in û çareserkirin û normalîzekirina wan karê plansaziyeke bi salan e. Di vê plansaziyê de pêdivî ji doh zêdetir bi hevahengiyekê heye. Geh ji ber xemnexuriya navxweyî, geh jî ji ber pêkutî û spartina ji derve, ziman û çanda kurdî nikare ji xwe re cokên siruştî ava bike. Di nav vê rewşê de ziman û çanda kurdî geh bi ser polîtîkayê re tê nirxandin, geh wek alaveke polîtîk, geh wek qadeke berxwedanê, geh jî êdî wek sembolekê tê teswîrkirin. Her çi dibe bila bibe lê tenê hewldana kurdan dê bikaribe vê rewşê biguherîne, berevajî bike û têk bibe. Yekane aktor û muxatabê vê rewşê bi hemû reng û dengên xwe, kurd bi xwe ne.

Li bakurê Kurdistanê, di van demên dawî de, ji bo ku balê bikêşe ser rewşa zimanî û xetereya pişaftinê bixe rojeva kurdan, hin hewldan tên dayîn, hin teşebis tên destpêkirin. Dawiya hefteyê komcivîneke berfireh li Amedê hate organîzekirin û 270 kes beşdarî vê komcivînê bûn. Gelek dezgeh, şexs û fikrên cuda, der barê rewşa ziman û çanda kurdî de danûstandin û gengeşe kirin û avakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî deklare kirin. Navê torê di komxebata pêşîn a 22-23'yê mijdarê de wek Tora Ziman û Çandan hatibû diyarkirin, lê ev nav bi daxwaza beşdaran, bi rêbazeke demokratîk hate guhertin. Di komcivînê de 12 maseyên tematîk û cur bi cur ên wek Maseya Weşangeran, Maseya Nivîskaran, Maseya Çandê, Maseya Hunerê, Maseya Ziman û Perwerdeyê, Maseya Odeyên Pîşeyî, Maseya Saziyên Hiqûq û Mafan, Maseya Karsazan, Maseya Ragihandinê, Maseya Akademîsyen û Sosyo-Lengûistîkê, Maseya Saziyên Jinan û Maseya Saziyên Zarokan hatin avakirin û di maseyên tematîk de babetên spesîfîk hatin diyarkirin û li ser wan gengeşe hatin kirin û rapor hatin pêşkêşkirin.

Di komcivînê de du rojan babetên wek mafên zimanî/çandî, pêwendiya ziman û nasnameya neteweyî, avakirina rê û rêzikên xebatên sivîl, arîşeyên navxweyî û derveyî yên ziman û çanda kurdî, astengiyên bingehîn ên li ber kavdana ziman û çanda kurdî, nexşerê, plansazî, statû û rêzikên bernameya xebata torê û delîveyên berfirehkirina torê hatin gengeşekirin. Di tabloya ziman û çandî ya li Bakur de, ji bo têkbirina polîtîkayên pişaftinê, rol û mîsyona siyasetvan, rewşenbîr, hunermend û civakê hate gengeşekirin. Rexne, tesbît û pêşniyazên pêwîst û pratîk hatin pêşkêşkirin. Sekreteryayeke berfirehkirî ya nû hate avakirin û ji bo meşandina karên torê, amadekirina rêziknameyê, diyarkirina logoyê û karîgerkirina torê, dest bi xebatan kir.

Avakirina platform û dezgehan karekî hêsan e, lê tişta girîng û zehmet ew e ku meram pêk bê, niyet hasil be. Ji bo wê jî ji bernameya torê bigire heta meşandina karê wê, ji berfirehkirina wê bigire heta karîgerkirina wê, kurd û sazî û dezgehên kurdan dê dahatûya ziman û çanda xwe diyar bikin. Avakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî, di dirêjahiya dîroka berxwedana ziman û çanda kurdî de ne destpêkek e, xelekeke serboriya berxwedana wan e. Beriya niha jî bi heman rengî gelek kar hatin kirin û heta dereceyekê encam jî hatin bidestxistin. Lê tişta ku li ser kurdan ferz e, domandin û xurtkirina hewldanên bi vî rengî ye. Her çend di salên dawî de bergindî êrîşên sîstematîk bêhêvîtiyek di nav kurdan de belav bûbe jî, sînerjiya ku ji komcivînê derket meydanê, geşedaneke pozîtîf bû. Gilî û gazinên ku ne li meydana girseyî tên kirin, di komcivînê de hatin kirin.

Avakirina Tora Ziman û Çanda Kurdî teşebiseke pêwîst û curetkar bû. Ku tor bikaribe xwe bigihîne hemû kurdan û cîgehên ku kurd lê dijîn, mekanîzmayên dînamîk di nav kurdan de ava bike, dê hem bigihê armanca xwe, hem jî roleke damezrîner û sereke bilîze. Em baş dizanin, ziman jî wek jiyanê, bi berxwedan, xebat û afirandinê mezin û ava dike. Em bi hêvî ne ku ev pêngav wê rêçekê veke û ji bo serkeftin û azadiya zimanê me kurdan.

Weswese 2

Şener Ozmen

Dojeha ku li can û cesedên xwe digere

Wekî ku tu pêwendiyeke hêvîbexş û berbiçav di navbera xebat û koşa mayîndekirina zanista rexneyî ya kurdî - ya di nav van dehsalan de başebaş geşbûyî - û çîroka (yan romana) kurdî ya modern de nîn be (!), tew nehatibe sazkirin, yan jî gehînbariya gotarên analîtîk ên di berhemên nolî bendname, folklor û roman, tîr û armanc, zanista edebîyata modern de cî girtibûn, ne pêkan bin, bi tirs û şayîşeke ku derziyên jehrîn ên cadûgeriya reş a kolonyal, di ser teheyûla 'dojehê' û îmajînasyona wê ya teqezkirî re cardin û cardin citî dilê min bibin, parîyekê jî bi dudilî dest avêtibû Dojeha (Dara, 2019) Recep Dildarî ya ku ji heşt çîrokên peywendîdar û kir û kiryarên dermirovî (mirov dikare kiryarên dijekurd, di heman demê de wekî kiryarên dijemirovî jî bipejirîne) pêk hatî.

Dildar, wekî ku di kurtejînenîgariya xwe de jî gotî, li Diyarbekirê bi qasî şeş salan mamostetî kiriye û paşê, ji ber fikrên xwe -bêguman yên siyasî- hatiye girtin û çar salan jî di zindana Diyarbekirê de maye ku ev demek e, jînenîgariyên guhêrbar -yan jî guherînbar- yên nivîskarên me yên kurd û gotinên zimangez yên destpêka çîrok û romanên kurdî dêhn û bala min dikişîne.

Bo nimûne, di sêyemîn pirtûka helbestan a Îrfan Amîdayî de (Şopa Neşûştî, 2005) kurtejîyan, weke formateke nas, bi mêjûya zayîngehê, pê re pê re biragehînên perwerdehiyê û berhemên wî yên çapbûyî bi dawî hatiye û di duyemîn romana xwe de Îrfan Amîda (Şevek Şîzofren, 2018), çend agahiyên din li kurtejîyana xwe zêde kirine û di dawiyê de jî, cî daye dûrxistina xwe ya ji bajarê Mêrdînê. Mîna ku nivîskêr bi vê ragehînê re xwestibe, asayîya (rûtîna) kuşinde ya di jiyana nivîskarên kurd ên di navbera nûseriya li bajêr û bajarokên Kurdistanê û jiyaneke bê xirecir de asê mayî, bi agahdarkirina rewş û pergalên ku ne bi destê wan tên an hatine guhertin, silavek bide xwînerên kurdî jî.

Çi ku li vî welatî hemû tiştên ku jiyanê (jîyana asayî) li me dikin jehr û qeratî û dû re di dilqê çîrok û romanan de dîsan li me vedigerin, di heman demê de wênesûretê jînpîv (biyometrîk) ya/yê nivîskaran jî şanî me didin: Em dizanin wekî niha, belê niha, tam di vê kêlîkê de çi dikin û bi çi û çi mijûl in, lewre em dizanin wekî tiştekî nakin (anegorî daketin û bilindbûna pileya siyasetê û tiştên din), li wan bajar û bajarokan giyan û jiyan hevreşî hev bibin û hev du li qaqa reş jî asê bikin, em bêgav in ku bipên.

Îja, di zincîreçîrokên Dojehê de ya ku bi gotinên ramanwerê fransî Michel Foucaultyî ve dibe ku Dildar, bi vê yekê daw û doza ji nû ve xwendinekê jî (ji bo Zayîna Bendîxaneyê) ji me dike, hevoka pêşîn a çîroka yekem (Lawikê Amedî, Dojeh) ev e; "Îro ez ji îşkencexaneyê derxistim." (r. 11)

Naxêr, em li bendî hevokeke wiha bûn; "Ji niha de bibêjim wekî ez jî yek ji wan peyayan im ên ku di balafirê de, ji jêrzemînê heyşt hezar metre li jorê, di valahiyê de û di zikê qûtiyeke metal de xwe ji bîra dikin û li du vêsabûna xwe, çewaniya meyê, çêj û tehma xwarinê û firehiya palkursiyan dikevin."(Serenad, Zulfu Livaneli), yan jî, "Mûcîzeya herkesî heye, a min jî ew e! Azadî ew e ku, bi her sibeha ku tu şiyar dibî re, karibî heman tiştan bikî."(Kumral Ada Mavi Tuna, Buket Uzuner), yan jî, "Bextewartirîn kêlîka jîyana min bûye, min nedizanî." (Masumiyet Muzesi, Orhan Pamuk), çi ku em ji vê yekê hayîdar in wekî destpêkên me wisa nîn in û lehengen me bi şetele û şuhûkên nedîtî, bi gilî û gotinên ji ber xewnereşkan mayî, bi serborîyên kambax ta bi derziyê ve dikin û ji naxê jîyaneke ku ne aydê me ye, dipeyivin.

Bi tenê, xwînereke/î kurd dikare li dû hevokine ku bi peyva îşkenceyê dest pê dike, bikeve û heya bi dûmahîkê (dûmahîk jî hey reşetarî ye) rê bibire, mîna ku ev yeka wê/wî ne xwendin, lê alegorîyeke xwendinê be. Paul de Man yê ku di Alegoriyên Xwendinê de dibêje, yek ji şertê bingehîn ê watesazkirinê, şaş xwendine û tevayiya xwendinê jixwe alegorîk e û alegorî bi figûran pêk tê ku di esasê xwe de metafor e.

Ji lewre Recep Dildar, di çîroka Dojehê de, metafora dojehê, ya di destên gorbihuşt Mehmed Uzunî de û xasma jî di romana wî ya bi navê Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê de bûbû klîşeyeke berevajîbûyî (Alan, 2014), li wateya wê ya Foucaultyî vedigerîne, her weha ji klîşebûnê jî azad dike; "Jixwe hepisxaneyên Dîyarbekirê, ji berê ve navdar in, gelek kilam li ser hatine gotin. Û her ku agirê dojeha Amedê gur dibe, li derve dengbêj û stranbêj destê xwe didin ber guhên xwe diqîrin." (r. 51) Pirsa Foucaultyî ye; cezayê ku nagihîje laşî, ma dê çi be, dibêje di Zayîna Bendîxaneyê de.

Gava em li wêneyê nivîskêr yê li paşbergê xistî hûr dibin, çi dibînin gelo? Hêvî? Na! Bêxemî? Naxêr! Sawêra ciwanekî kurd î reşebext? Belkî… ne qala Welatê Mezin û ne jî ya Welatê Çîyayan(Mehmed Uzun) tê kirin, em nivîskarekî figûral jî (Alan, 2014) nabînin, dojeh ne welat, lê girtîgeheke li wî welatî ye, wekî ku girtîyê wê dojehê jî dibêje; "Bi hezaran pêxember hatine vê herêmê, heta hemû pêxemberên em pê dizanin, hatine vê herêmê; lê dîsa jî nikaribûne wan bikin meriv û dojehên bi destên mirovan tune bikin. Rojhilata Navîn bûye dojeha cîhanê û di nav vê dojeha mezin de dojeha herî dijwar niha li Amedê ye."(Dojeh, r. 48)

R. Dildar, Dojeha xwe, diyarîyî hemû girtîyên Zindana Amedê dike, belam ji alîyekê ve jî dixwaze hemû kitêbên ku behsa dojehan dikin, bişewitîne û xwelîya dojehan li ber bayê bixe. Ya rast, tişta ku di navbera Dojeha Xwedê û Dojeha Amedê de diçe û tê (r.57), ne hiş û bîr e, laş e, ku em bi hizr û bîrên Foucaultyî bibêjin, laşê ku xwe bera nav qadeke siyasî daye, ji ber hindê ye ku tê dorpêçkirin, deximandin û kedî kirin…



xwebûn

20-26 Çile 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 5

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazıişleri Müdürü: İdris Gürmez
Yayın Danışma Kurulu:
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Yönetim Yeri: Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

Keştiya Alalû

Agît Yazar



Qada şerê dêwan: Dara

Havîna pêrar bû. Em li nav bajarê antîk ê Darayê digerin. Zarokên Dara yê bi kurdiya xwe ya şîrîn ji me re rêbertiyê dikin. Li her dereke Darayê, rêberên me diguherin. Ez fam dikim ku her cihek, aydê hinekan e. Wexta em dadikevin zindana Bertewîl a Darayê, 4-5 rêberên qîz ku temenê wan di navbera 7-10 salî de ye, me li nav zindana Bertewîl a Darayê digerîne. Ji bo axaftinê, yek rê nade yekê. Ez dixwazim a tewra piçûk bipeyive. Rêbera min a piçûk û porgijik destpê dike: "Ev ewil embara avê bûye. Romayiyan xerca wê bi sipîka hêka 'deve qûşû' çêkiriye..."

Wexta rêbera min a piçûk dipeyivî, te digot qey şekirê mêtinê li ser zimanê wê ye; wanî bi mirçemirç dipeyivî û tahma devê xwe xweş dikir. Em hemû gotinên rêbera xwe ya porgijik rast dipejirînin û derbasî ser hewzhezwkan dibin. Li wir jî rêberên piçûk û xwînşîrîn me pêşwazî dikin.

Li nav nekrepolê ango li nav bajarê miriyan jî, vê carê stranbêjekî nepen ku xuya bû ne yekî temam e, derdikeve pêşberî me û dest bi strana xwe dike: "Wêran wêran gundê mino/wêran wêran gundê mino/wêran wêran gundê mino!" Stranbêjê min û we hem distra û hem jî direqisî.

Niha em ê stranbêjê xwe yê nepen û gundê wî yê wêran li nekrepola Darayê bihêlin û em ê ji 2 hezar û 500 sal beriya niha dest pê bikin û werin heta gundê stranbêjê xwe yê wêran.

Îskenderê Mezin

Kêm zêde 2 hezar û 500 sal berê, Kroj ê neviyê Aştîyago yê serwerê împaratoriya Medan, bi hevkariya Harpago yê bêbext, bapîrê xwe Aştîyago ji textê wî dike û bi vî awayî hukmdarîya împaratoriyê, ji destê kurdan derdikeve û deikeve destê Persan.

Êdî kî lawê bavê xwe ye Persan bide sekinandin. Lêdixin diçin welatê Lîdya, Lîkyayê dagir dikin û di ser giravên Egeyê re derbasî Yewnanistanê dibin. Li welatê Yewnanistanê jî kesekî bi navê Efialtes hebûye. Çawa ku Harpagoyê kurd, bêbextiyê bi gelê xwe dike, Efialtes ê yewnan jî wanî bêbextiyê bi gelê xwe dike û dibe sedema têkçûna qralê Spartayê, Leonîdas û 300 şervanên wî.

Bi vî awayî pers, ji Atînayê bigre heta Makedonyayê tevî wêran dikin û heta persetegehên yezdan û xwedawendên wan jî dişewitînin...

Bi vî awayî, tir û vira Persan derdora 200 salan dajo. Paşê B.Z di sala 336'an de, Îskenderê kurê Felîp ê makedonî radibe bi artêşeke ji 35 hezar leşkeran pêk tê, serî li hemberî qralê Persan, Daryûş ê sêyem radike.

Îskender, cara ewil li rex çemê Granîkos (Bîga) li dijî Persan re şer dike û bi awayî cara ewil Pers têk diçin. Îskender li wir nasekine, tê li geliyê Îsosa bi ser navçeya Îskenderûna niha ve, cara duyem Daryûş têk dibe. Tê gotin ku Daryûş hevjîna xwe ya bi navê Asya û diya xwe li pişt xwe dihêle û direve.

Daryûş direve, Îskender li pey wî ye. Daryûş dike nake nikare Îskender razî bike û şerê man û nemanê li gundê Gaûgamala yê bi ser Erbîla îro ve dest pê dike. Li vê derê jî Pers têk diçin û Daryûş ji qada şer difindirîne, dibêje xirp û direve. Îskenderê min û we diçe Persepolîsa ku dilê Persan bû dişewitîne. Bi vî awayî bernavê xwe yê Mezin bi dest dixîne û dibe Îskenderê Mezin.

Tolhildana Persan

Îskenderê Mezin û generalê wî Selevkos nigên xwe rakdikin, împaratoriya Romayê pêl li dewsa piyên wan dike; ango bi awayekî ji awayan Roma, mîrasa wan werdigire. Vê carê împaratoriya Romayê û hukumdariya Partan derdikevin hemberî hev.

Di navbera van her du dêwan de, hukumdariya Komagene û Kurdûene hene. Ev her du hukumdarî jî yên kurdan in. Lê Part û Roma, tu tahmê nadin wan, nexasim jî Part ango Pers. Bi vî awayî, axa Mezopotamyaya jorîn, di bin simên hespên Roma û Partan de, nola hevîr tê vestrandin.

B.Z di sala 53'yan de, li herêma Herana îro, şerekî mezin di navbera Romayê û Partan de diqewime. Di vî şerî de, Part bi ser dikevin û generalê Romayê, Marcus Licinius Crassus dîl dikeve destê Partan. Ev generalê bi navê Crassus, ew general e ku wî serhildana şoreşgerê mezin Spartakûs têk biribû.

Tê gotin ku Persan zêr helandiye û berdaye gewriya general Marcus Licinius Crassus ê romayî. Bi vê jî dilê wan rehet nabe, çermê wî digurên û tije ka dikin û kêfê lê diqewitînin. Piştî vê gosirmeta mezin, bi qasî 300 salan şûnve, ango P.Z di sala 243'yan de, şahê Sasaniyan ê bi navê Şapûr, li derdora Ûrfayê, împarator Valeryanûsê romayî dîl digire.

Tê gotin ku Şapûrê şahê Sasaniyan, tibabekî Valeryanûs li gel xwe digerîne. Her cara Şapûr li hespê xwe siwar dibe, bangî Valeryanûsî dike. Valeryanûs xwe jê re ditewîne, Şapûr pêl li pişta wî dike û li hespê xwe siwar dibe.

Jinûveavakirina Darayê

Her çiqas dîroka Darayê ya xwe dispêre 2 hezar 300 sal beriya niha jî, di esasê xwe de di sala 505'an de, împaratorê bîzansî yê bi navê Anastasius, sûrên Darayê ava dike. Dirêjahiya sûran 4 km ye. Împarator Anastasius, li hemberî Sasaniyan di hundurê sûrên gelek zexim de garnîzonek ava dike. Hemû tiştên pêdiviya wan bi wan heye, di nav sûran de bi cih dike û di bin erdê de jî gelek embarên avê çêdike. Heft km ji geliyê Kordîs û her wiha Kurka Çeto, bi qasî metre û nîvekê erdê dikole û tunêla avê tîne berdide berî ser embaran dide. Di heman demê de, embarên zexîreyan jî tên avakirin. Ev amadekariyên wan ên ji bo bergiriyê, têra wan dikin ku dikaribin bi mehan li hemberî dorpêçê li ber xwe bidin û jiyana xwe bidomînin.

Di dawiya sedsala pêncan de, şahê Sasaniyan yê bi navê Qewad, bi 20 hezar siwarî, ew çend jî piyade û 120 hezar ji xelkê sivîl, digre ser Darayê. Dikin û nakin tu keysa wan lê nayê. Bi mehan li dora Darayê diçin û tên. Jahrê davêjin nav avê, lê tu bandor li leşkerê romayî nake. Lewra romayiyan bergiriyên xwe baş kirie û coav di bin erdê re, xef aniye nav bajêr. Ji ber ku wan berê texmîn kiribû, çaxa Sasanî bigirin ser wan, ew ê jahrê bavêjin nav çemê tê nav bajêr. Loma jî tu kesekî ji wê ava bi jahr venexwaribû û ev plana wan pûç bûbû. Şahê Sasaniyan Qewad, dixwaze neqebekê di dîwarê sûrê de veke, lê di vê plana xwe de jî bi ser nakeve.

Sîmyakarek radibe û aqilekî dide şahî. Şah bi ya simyakar dike û zeytê dixin cirran û davêjin ser dîwarê sûrê. Paşê jî agir berdidin dîwarê zeytkirî. Bênavber vê yekê pêk tînin. Dûre jî cirrên sirkê davêjin ser dîwarê sincirandî. Bi vî awayî kevirên sûrê di ser hev de diherifin tên xwarê û Dara dikeve destê Sasaniyan.

Piştî 16 salan, Roma dîsa Darayê ji destê Sasaniyan derdixîne û ji nû ve ava dike. Sêzdeh sal derbas dibe, car din Sasanî Dara ji Romayê distînin. Ev rewşa hanê gelek car wanî xwe dubare dike.

Piştî hingê, vê neqlê Dara dikeve destê artêşa musulmanan û ev der hêdî hêdî îhtişama xwe wenda dike.

Bertewîlê Darayê

Di serdema Merwaniyan de, kesayetiyekî bi navê Bertewîlê Daraê radibe û dibe hukumdarê Darayê.

Ji ber ku Dara li ser riya hevrîşîmê ye û her wiha xwediyê çeme jî, Bertewîlê Darayê hem baca riya hevrîşîmê ji bazirganan distîne û hem jî heqê avê ji êlên Ereban distîne. Tê gotin ku Bertewîlê Darayê, bendavek jî li ser vî çemî çêdike. Wexta havînê av kêm dibe, ev bendav gelekî nirxdar dibe û Bertewîlê Darayê, tibabekî ji vê rewşê sûd werdigre.

Ev rewşa hanê, di navbera Bertewîlê Darayê û êlên Ereban ên li jêr de, gelek caran dibe sedema şer û pevçûnan. Lê ji ber ku Bertewîlê Darayê, mirovekî helorpelorî, pirî xurt û bi qilafet bûye, zû zû tu kesî newêribûye xwe têderbixista.

Heta niha jî xelkê herêmê, ji mirovên nola pêlewanan xurt re dibêjin, filankes bi qasî Bertewîlekî ye. Ev yeka hanê, pêlewantiya Bertewîlê Darayê bi me dide selimandin.

Efesa Mezopotamyayê: Dara

Dara, dikeve navbera Mêrdîn û Nisêbînê. Nêzî 10 km dûrî sînorê di navbera bakur û rojavayê Kurdistanê ye. Di sala 1980'yî de dest bi kolandina arkeolijîk a Darayê tê kirin. Heta niha ji sisêya yekê wê jî nehatiye kolandin. Ango beşeke wê ya mezin, hîn jî di bin axê de ye û li benda derxistina ser rûyê erdê ye. Tê texmînkirin ku beşek ji vî bajarê antîk ê xwediyê cihekî gelek stratejîk e, di bin erdê de hatiye avakirin.

Heta niha, beşek çarşî, keleh, pir, coav, sarinc û embarên avê; dêr, qesir, zindan, topxane, gorên di tahtê de kolandî û wargehên sivîlan hatine dîtin.

Cihê ku herî zêde bala meriv dikişîne, şikefta sê qat e. Di vê şikefta ku bi dest hatiye kolandin de, hestiyên 3 hezar leşkerên romayî veşartin. Li ser devê vê şikeftê, rulyefên niwaze yên li gorî baweriya ola xiristiyaniyê hatine niqirandin hene.

Wek serencam

Dema min ev nivîs ji bo rojnameya Xwebûnê amade dikir, generalê Îranê Qasim Silêmanî ji aliyê Amerîkayê ve hat kuştin. Ev yeka hanê, puxteya vê nivîsê ye! Ev serê 2 hezar 500 salan ne û beriya wê jî, vê erdnîgara me aramî nedîtiye. Gelê kurd, her cara ku ji xwe re sitargeh û jîngeh ava kirine, hêzeke barbar hatiye û ew wargehên wan wêran kirine.

Ê de bistrê stranbêjê Darayê yê nepen, bistrê! Li ser gundê xwe yê wêrankirî bistrê: wêran wêran gundê mino! Wêran wêran gundê mino!..